


# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



38

1994

## NAVEROK

Çend gotunê pêşıya ji devera Duhokê- R. Amêdi.....	3
Çend problemên kurdên Sovyetê- Tajdin Biroyêv .....	5
Dî muzika folklori da şertên lêkolinê - Eshed Muhammed Ali Werger: Xoşnav û A. Gernas .....	12
Filmeke Kurdi: Tunel .....	18
Baweriya kevn a Persan, 4- Zerdeş Werger : Y. Çakmak, A. Gernas .....	20
Mem û Zin -Radyo-dramatik- Robert Alftan. Werger : Xalit Lezgin .....	22
Helbest- Ezmanê Kari .....	26
Serpêhati: Bavê Sero .....	27

**Bergê pêşin:** Rebwar Said

**Sal: 15**

**Hejmar: 81, Sıbat 1994**

ISSN 0283-5355

**KWEDI:** KOMKAR-Swêd  
**BERPIRSIYAR:** Şêroyê BOTAN  
**NAVNIŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr  
161 36 STOCKHOLM  
**TELEFON :** 08/ 26 23 75  
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska  
Arbetarföreningen  
**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş.BOTAN  
**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.  
161 36 STOCKHOLM  
**FAX:** 08/ 25 38 57

## ÇEND GOTİNÊN PESİYA JI DEVERA DUHOKÊ

Bî rasti çî millet ninin xudan kelepor nebin, lê millete Kurd yek e ji wan milletan yêt gelek zengin û dewlemend bî folklorâ xwe.

Gelek mirovêt jir u têgehişti yêt ji nav milletê me rabûyin, ewan mirovan gelek serburyê bî seri hatin, xweşi û nexwaşî, şer û aşiti, zengini û xezani, başı û xırabi gelek yê bî çavêt xu ditin. Wan mîrûvan nivîskê van serbûr û serhatiya yê kîriye gotin, ev gotine weki xetir u çêrane şev reşa dikjit u rêya karwaniya rohin diket, lewma ya pêtiviye her kesek ji me em van gotina bikeyne goharik dî guhê xu.

Ev gotine weki çiran e rêka mîruvi ruhni diken. Çînku dijmînêt me ji her çar layêt Kurdistanê perdêt reş u tari yêt dî rêka me da vedyin u nehêlaye ronahiya rojê bî gehite welatê me..

Her kesekê bî vêt dijina xuda ne helingîvit bila van gotina bî xu bikete rîber. Lî pey van gotina biçit, ev gutine rîberiya mîruvi diken. Ezê lî wê bawerê me eger ser kîşen milletê kurd ji kevînda u ta ku nihu lî dif van gotina vibana nuke ji mijê were em bibyine xudan dewlet, bibyine xudandost u heval lî vê cihana ber fireh nuke ji mîj werba (karkê me ji bin sevrikê derketi) nişan bu vê çendê xudê jê razi (Mihemed Emin zeki) dî pirtoka xu da (Mejuya kurd u Kurdistanê) dî laperê (247) da dibêjît (hindî carekê kurd ji şkestin wan bî xwe êk u du yê şikandin hindekan ji wan bawerya xu ya bî dijmîni inay nezanye ku (çîara mar nabîte yar) o hemi dema (ağır ji dehmana yê berbuye me) xuzi min diti me hemiya bî van gotina kiri daku dijmînêt me bî herdu çava kirba giri. Lî dimahiyê eve çend gotinên pêşîyan yêt Kurdistanâ Başûr ji devera Dihokê bo xwendevanîn kovara Roja Nû diyari...

**Rêkêş Amêdi / Kurdistanâ Başûr**

- 1- Gotinê mezîna nexşêt brine.
- 2- Heçiyê guhê xu ne dete mezîna dê hên şaxêt bîzîna,  
Heçiyê guhê xwe bîdete bîcîka dê hên şaxêt gidika...
- 3- Mezîna çî bu bîcîka ne hilaye.
- 4- Bîmre bî ser bîlindi belê neji bî ser şuri.

- 5- Dikîlê rojekê be, ne ku mîrişka salekê.  
 6- Çicara mar nebîte yar.  
 7- Çi marêt bê gelalişk ninin.  
 8- Dînya bîbite bîhust dîjmîn çicara nabîte dust.  
 9- Av dîrawestit dîjmîn narawestit (Av dînvit dîjmîn nanîvit)  
 10- Mêr bî mîra dîxurîn teyir bî perra difirin.  
 11- Se be ji qewmê xwe be.  
 12- Eger kîrmê darê ji darê nebit zewala darê çicara nabit.  
 13- Agîr ji dehmana berdibite mîruvi.  
 14- Dîjmînê babê nabîte dusti kuri.  
 15- Hîvi sed car hîvi ji milletê xwe nebe kivi.  
 16- Yê biyani tu bîdeyê goştê rani deliser te hêt pêşemani.  
 17- Xulamê gundê xwe be ne ku axayê gundêt xelkê.  
 18- Siyarê hespê xelki her yê peya ye.  
 19- Bî werisê xelkê neçe kevri.  
 20- Hiya dera xulya sera.  
 21- Destê bî tenê deng jê nahêt.  
 22- Siyarê bî tenê tuzê naket.  
 23- Serê du berana dî dizekê da nakelit.  
 24- Ez çiya tu çiya gulik ma bê giya.  
 25- Her şef reşekê roj helateka lî dif.  
 26- Her evrazyeki nişivyekê lî dif.  
 27- Heta mîruv bî ser destâ bî rîve ne çit qedra piya nîzanit.  
 28- Derman dermal e.  
 29- Her berek lî cihê xwe yê bî qedr e.  
 30- Çi dîkene karê ew dîhête xwarê.  
 31- Çi diciñin ewi dîhelinin.  
 32- Çeva ba dîhêt dê bêderê wesa deyine bay.  
 33- Ya diskê dê hêtê şkefkê.  
 34- Diskê got ez ya renginim hîskiyê got ez ya lî binê te geriyayim.  
 35- Pêşti mîrnê çav kuli nine.  
 36- Dest dîzanit kirê dîxuryit.  
 37- Pîrê lî qulingi nehavêje avê.  
 38- Befir diciçit çiya dîminit, mîruv diciçit nav dîminit.  
 39- Kerawa xurawa.  
 40- Kulkê pirê xuştire ji qesra mirê Cîzirê.  
 41- Kesê kulkê xwe ne xîrabkiriye pêş qesrêt xelkê ve.  
 42- Heta ez dîbîm u dîbîmeve dê çim kem u hême ve.  
 43- Eger tu yê nezani çav bîde cirani.  
 44- Befir qeyida mîrane.  
 45- Çi roj baran e ew roj zîvîztan e.  
 46- Kes bî tîra germ nabit.  
 47- Hemam bî tîra germ nabit.  
 48- Kes bî pêlekê nagehîte serê milekê.  
 49- An nebêje an bîke.  
 50- Yê bîbêjit u biket mîr e, yê nebîjit u biket şîr e, yê bîbêjit u neket kerê nîr e.

# ÇEND PROBLEMÊN KURDÊN SOVYET

Ev nîvisara jêrin, gotara serokê giştî yê Navenda Çanda kurdi ya navnetewi li Moskowayê **Tajdin Bîroyêv** e, ku wi dî "Konferansa "Kurd: aspektên cîvaki û êtnoçandi" da xwendiye. Gotar dî hejmara 22-23 ya rojnama "Golos Kûrda" da bî zîmanî rûsi derçûye. Em kurdiya wê pêşkêsi xwendevanê Roja Nû dikin.

Gelê Kurd ê li ser axa Yekitiya Sovyet dî dawiya salêن 1980 da êdi texmin kîr, ku dî nava jiyanâ wi da pêwist e ku guhaştınên mezîn bibin. Gava xwefehmdariya gelên Sovyetistanê yê neteweyi bî tevayı bilind bû, yênu ku dixwestin jî bona zêtir pêşdabırına çanda xwe ya mîletiyê, firehkîrîna xweserkarkîrinê qewla saz bikin, texmin kîrin ku wê demê pêşda hatîye. Em bîdne kîvşê, ku ew ne tenê jî bo wan mîleten ku li ser axa Yekitiya Sovyet xwediyê dewlet an ji otonomiya xwe ninbûn, lê herweha bona mîleten xwedi dewlet bûn ji. Dema demokratizasyona hemtomeri, xwefehmdariya gelan ên neteweyi bî carekê va bilind bû. Dîxwazim bîdne kîvşê, (ku hûn wê yekê rînd dîzanîn) ku carna daxwazên filan an ji bêvan mîleti ewqas jî daxwazên wan gelan dihatine cudakîrinê, ku li rex wan dijiyan, ku tevi hemû paşvamayinê xwe ji ew dibûn daxwazên neteweyi. Dî vê prosesê da xîringêle çêbû û em ji bûne ziyankêşki wê.

Gerek em bîdne kîvşkîrinê, ku gelê Kurd xwe li ekstremizmê negirt û pîrsên biaqîl û kîrhati dani ber serkariya welêt, dani ber komarêن pişt Kavkazê ku piştî Şoreşa Oktobîr

bûbûn xwedi komar. Ew pîrs bî pirani dî derheqa razikîrîna rewacêن wan ên mîleti û çandi, safikîrîna çend problemen cîvaki, dasekinandina mafên gelê Kurd bûn. Wek hûn ji zanîn, dî salêن 30 yi da Kurd gelek tişt winda kîrin. Serbarê ser, bî hezaran Kurd surgûni navçeyen Asiya Navin û Qazakistanê kîrin. Derheqa vê yekê da, me vê xeberê bî hûrgili dî rojnama "Golos Kûrda" da şirovekîriye.

Îro dijwar e em bêjin, ku me bî alikariya organîn Sovyetistanê çi dîkaribû bikira, lê tişteki izbatkîriye, ku dî yekitiya dewletê da mafê gelê me hebû ku xwedi maf û azadiyêñ weke hev be, wek gelên mayin ên ku bî jîmara xwe va hindîk bûn. Kurd dî welateki da dîman û dîkaribûn problemen xwe danina ber serkariya dewletê û dawa safikîrîna wan probleman bikira.

Ez bawer im ku, hûnê bî min ra qayil bin ku me pîrsên xwe gelek berk daniye, hemû gav ji ew bî aqilane bûne lê ya heri sereke ku ew tevlîhev bûne. Her cara ku ev bûyer qewîmiye, Kurden regionêñ (navçeyen) din zanibûn ku nûneren gelên me yêñ jî regionêñ mayin çi û çawa dîxwazin bikin. Xuyani ye ku, li vir sebeb ne dî nex-

westnê da ne, lê dî wê yekê da ye ku ew (Kurd) wan dema bî hevra bî tîfaq ninbûn, me tebiya xwe yê yekitiyê ne pîr zelal amade dikir.

Dû rûxandina Yekitiya Sovyet rewşa gelê me hin xirabtir bû. Em bûne xelkê deh dewletên serbest.

Bî salixiyêن jimara bineciyan a bî hesabê l'ê Çileya Pêşin sala 1989'an li ser axa Sovyetistanê berê 153 hezar Kurd hebûn. Dî wê jimarê da:

- Lî Rûsyayê qasi 50 hezar
- Lî Úkraynayê, 401 meri
- Lî Ozbekistanê, 1839 meri
- Lî Qazaxistanê, 25481 meri
- Lî Gurcistanê, 33327 meri
- Lî Azerbêcanê, 12211 meri. (dî vê jimarê da 3127 meriyêن Naxçıwanê ne)
- Lî Qırğızistanê, 14262 meri
- Lî Tacikistanê, 61 meri
- Lî Ermenistanê, 56028 meri
- Lî Turkmenistanê, 4385 meri.

Femdari ye (wisa xuyaye) ku, dî nava çar salên hesabkirina binecyan da ev jimar geleki hatiye fuhartînê. Ü eger hesabkirina bineciyan irobihata derbâzkirinê, rewç wê lap bî awaki mayin bûya.

Ya pêşin, bî sebebên cihê cihê hinekan ji nûnerên hesabkarê ji bineciyan ra gotine, ku ew ne Kurd in. Lê hinek ciya, zagona derheqa hesabkirina bineciyan da teribandine û lî pasaporta nivisine, ji mirovan nepîrsine ku xwe ji kijan mileti dihesibinin. Lê dî pasaportê da, wek ku xuyaye, ba gelekan navê her mileti hatiye nivisandin, bili milete Kurd. Carna dî dewsa milet (netewe) da din nivisine, wek nimûne Ezdi nivisine, carna ji Qavqazi, ji ber ku ew an ji dê û bavê wan ji Qavqazê bûne.

Ya duduuya, tevlîhevi û şer û dawayê navbera miletan da yê van salên dawi, naveki nû ji birayêne me ra ani, Kurdên mihacir. Niha tenê li parwelatên Krasnodarê û Stavropolê, komara Adigeyê da bî deh hezaran mihacirên Kurd hene. Hiç mafeki wan tune. Rast e, geleka ji xwe ra xani kîrine, lê wana wek mîlteci (penaber) qebûl nakin. Lema ji, pîrsên xebata

wan, qenckirin û xwendîna zarokan, alikaroyêن ji bo kalbûn û pirbûnê nayê safikirin. Zêde ye ku meriv derheqa razikirina rewacên Kurda yê çandi bipeyiye. Em ser wê baweriye ne, ku dî mexlûqatiya pêşketi da tiştên wa nikare nikare dirêj berde-wam bike. Em careki din berbiri ser-kariya Rûsyayê dîbin û geleki hêvi dîkin ku li problemên mihacirên Kurd bînihêre.

Navenda me çiqas karibû, ewqas alikari da mihacirên Kurd, lê hilbet ew cilkek bû dî nava deryayê da.

Me cehdand ku ji Komita hevalben-dên Awrûpayê ji bo mihacirê Kurd alikariya humaniter bistinîn. Bona wê armancê me nameyek ji ji balyozxana wê Komiteyê rali ser navê Emêrson ra şand û dî nameyê da me hêvi kîribû ku alikariya mihacirên Kurd bîkin.

Dî nava nameyi xwe ya besivdayinê da maqûl Emêrson da bawerkirinê, ku ew rewşa Kurda ya giran têdigihije û bona wan gelek xemgin e, lê alikari neda. Aha, rewşa me wa ye.

Lê bê pere hiç tişt nayê kîrinê. Rewşenbirên me ji destpêkê da bona vê yekê me gunehkar dikir, ku em bî komêrsiyê va mijûl dîbin. Lê xema kesi nibû, ku ji kuderê pera hîldin. Ne axir dewlet hiç quruşeki ji nade me. Me van dawiya pere bî deyn xwest (salê 140%), lê nedan me, ji ber ku dî ber wê da gerek milk bidin, lê hebûna me pîr tuneye. Hebûn hindik e û deyn ji pêwist e.. Deyn nadîn, ji ber ku hebûn hindik e. Goveka gêjgeringê ye.

Em bî komêrsiyê va mijûl bin an na? Gelo em ji komêrsiyê dewle-mendtir dîbin? Mêzekin, tenê ji bo kîryea ofisa me (dî nava çar sali da usa ji ofis nedan me), em her meh 90 hezar rûble dîdin. Enflasyon gihiştiye wê derecê, ku mesrefen ser rojnameya me li ser me 100 hezar rûbil rûdinê. Tenê kîryea salonê ya bona temaşehêha wêneyênen wêne-kêşen Kurd bî 100 hezar rûbil li ser me rûnişt. Em êdi xercen mayin nahesibinin.

Me dest pê kîryea ku dibistaneki be-

dewtiyê ya Tîblisê bona zarokên Kurd a yên jir û jêhati finanse bikin. Dî pêşerojê da em dixwazin temaşegeha wêneyêñ zarokên Kurd bîdne raxistinê, dî bin dêviza (navê) "Zarokên Kurd dixwazin bibine xwediyê welate xwe."

Lê em dixwazin, bili alikariya mihaciran, xwendekaran û karêñ mayin, herweha çend projektên çandi ji pêk binin. Jî bo nimûne, li xeznekilerên Rûsyayê da destnivisarên derheqa çanda Kurdan da hene, yên ku gerekî bikevin mala her Kurdeki, lê gerek e vana biweşinin. Iro bî dehan destnivisarên zanyaran, Kurdzanan amade ne, lê dî van qewlan da kesek wana çap nake.

Carna Kurdêñ welatên dereke jî bona alikariyê berbiri me dîbin, lê em her cara nîkarin alikariya wan bikin. Nimûna dawi: Du rejisorêñ Kurd ên jî Sûriyê filmeke niştimanperweriyê derheqa Kurdistanê da amade kîribûn (me derheqa vê yekê da dî rojnama xwe da gotara bî sernivisa "Şewat" çap kir). Firmaki Moskov a sinemayê soz da ku jî bo kişandina filmê alikariya wan bîke, lê 30 milyon rûbil pêwist bû. Me dixwest jî sê para parek bîda, lê bona cema (beşa) mayin em berbiri rêxistinêñ Kurda yên Parisê û Brukselê, navendêñ mayin bûn. Lê heta vê demê jî wana hiç bersiv tune.

Awa pursêñ çandi warguhêzi pirsêñ siyasi dîbin. Yek bî ya dinê ra kip girêdayi ye.

Bî gîliki dîn, bêyi pera iro gelek hindik tişt dikarin bikin. Eger yek jî rexnevanêñ me zane ku çawa bêyi komêrsiayê pere bistinîn, em ê bî dileki baristan wê temi û şiretê qebûl bikin, jî ber ku bî me ra komêrsia jî bo komêrsiayê ne pêwist e.

Helbet me dikaribû banka xwe ya navnetewi saz bîkira, wek ku demekê bingevanêñ dewleta Israilê kîrin. Eger hemwelatiyêñ me, jî welatên dereke yên dewlemend jî bo sazkırına bankekê uas alikariya bîkîrana, ew dikaribû bibûya delilê finansekîrinê jî bo pêkanina projektên mezîn dî

dereca çanda Kurda him li bal me, him ji li welatên dereke.

Gerek e em sîpasiya xwe bîdne serokatiya Şêwra Mîleta ya Parlamanâ Rûsyayê, herweha Remezan Abdulati-pov û Vitaliy Sirovatko, yên ku guhdariya mezîn danine ser rewşa Kurda ya xîrab li Rûsyayê. Awa, serokê Şêwra Mîleta ya Parlamanâ Abdulati-pov R.G. bî nama berbiri çend wezirxana û dayira bûye û hêvi kîriye ku alikariya Kurda bikin.

Dî namê da tê kîvşkîrinê, ku "Wezirxane û dayirêñ Rûsyayê, komarêñ ku dikevine nava wê, hela (hêj) bona pakkırına rewşa Kurdêñ mihacir a xîrab mecalêñ baş qebûl nekîrine. Bona vana carna qestbende dijwari têne sazkîrinê". "Serokatiya Şêwra Mîleta ya Parlamanâ Federal a Rûsyayê, — dî namê da hatîye nîvisandinê — ser wê baweriyê ye ku, gerekî guhdariya wezireta, dayira bîdne ser wê yekê ku nehêlin daxwazîñ Kurdêñ mihacir yên rojane bêne inkarkîrinê."

Serokê Şêwra Mîleta pêşniyar dîke, ku dî regîyonêñ Rûsyayê da cih bîdne cihékîrinê, jî bo ku Kurdêñ mihacir bî kompakt bijin (ango li ciheki kîfşkîri kom bîbin), bona wana gun-dêñ mîletiyê çêkîn, ali malêñ Kurda bikin bona ku ew derbasi ser kar bîbin, problemen wan ên mali bêne safikîrinê.

Em dixwazin bî bangâ berbiri mer-vîn xwe bin bona ku zef aktiviyê diyar bikin, lê ne ku herdem bona bextê gelê me gazinê jî xwe bikin. Ne axî dibe ku nûnerê olkeke (diaspora) Kurda ew hejmara rojnameya me hilde (li ku ev gotinêñ min hene) û here ba serokatita navçeyê û pîrs bîke, ku jî bo çî teminiyêñ serokatiya parlamentoyê bî cih naynîn? Û eger wîra ji huh nede, bîra berbiri parlamanâ Rûsyayê bîbe, ku çawa li filan cihêgûh nadînê. Ez bawer im ku, ew ê alikari bîkîra.

Kurt goti, Kurdêñ mihacir li ser axa Rûsyayê dokumenteke gîring sitendîne, û gerek her tişti bikin bona ku ew karê (feydê) bîde. Ew bî me her yeki va girêdayi ye, beri gîşka jî enda-

mên Pêşengiya Kurda yê "Yekbûn"ê, yên ku gerekê ali merîva bikin sere-deri li wan pîrsa bikin, hini wê yekê bikin, ku daxwazêwan anegori Konstitûsiyayê bêne parastinê.

Hela destpêka salê da cigirê serokê Şêwra Mîleta ya Federasyona Rûsyayê Vitaliy Siravatko, hevpayvin da rojnameya me. Hewaskar e sernîvisara wê hevpeyvinê: "Daxwazê gelê Kurd heq in."

Gerekê bê gotinê ku, çend weziret bi opératiivi berbiri nama R.G. Abdulatipov bûn Me dî meha oktoberê da (Çiriya Pêşin) gotara "Weziret bersiva Şêwra Mîleta ya Rûsyayê didin", çap kîr.

Ez tenê parekê ji bersiva wezireta karêñ hundur binim, ya ku derheqa pîrseke giring a ser malê nîvisara mihacira da ye. Dî nava nîvisara weziretê da tê gotin ku, "wezirxane elami (agahdari) Şêwra Mîleta dîke, ku niha ciwarkirina Kurda bî wê yekê va dijwar e, ku dî komarêñ Kabardino-Balkariyayê, Osetiya Bakûr, parwela-têñ Krasnodarê û Stavropolê da ser malê nîvisara mihacira hatiye kêmkirinê. Ev kêmkirin diji zagonêñ heyi ye".

Ez ji bo çi aha bî hûrgili li ser vê pîrsê sekîmim? Bona wê, ez bawer im ku, hûnê ji bî min ra qayil bin ku, bona mirov tiştê heri xîrab ew e ku ew bê mal be, gava tu nîzanîbi wê sibê çi bê serê te û zarokêñ te. Ez ser wê baweriyê me ku, gotineke ji gotina "mihacir" xîrabtir hiç tune. Bav û ka-lêñ me vê yekê ji destpêka sedsalê da li ser xwe texmin kirin, lê niha ji ew yek para me ketiye. Lê gerekê serê xwe li ber qederê daneynin. Dokument û zagon ji xwe ra bikne bingeh û daxwazêñ xwe biparêzin.

Dî 18'ê Gulana sala 1992'a da hukumeta Federal a Rûsyayê biryar qebûl kîr, ("derheqa bernama komaretiya demdirêj ya "Migrasiya", hejmar 327") Li wê derê hemû mafêñ mihacira û milteciya (penabera) têra hatîne ditinê. Me bernama "Migrasiya" xusûsi dî rojnama xwe da da çapkirinê, bona ku xelk

bikaribe ser wê hin bibe û pîrsêñ xwe safi bike.

Telebext ra (mixabin) iro baweriya me bî wê yekê tuneye, ku mihaciriya gelê me yê pîrzêrandi êdi kuta bûye û dîmine ku tenê alikariyê bîdne wan kesen ku bê cih û war mane. Rewşa pîraniya wan navçeyan, li ku derê Kurd kompakt dijin, ne baş e.

Em ji gîşka pîrtir bona wê rewşê ber xwe dîkevin, ku rûyê Azeriya dî Ermenistanê da pêşda hatiye. Em naxwazin wi şeri bî qimet bikin, sebeba şîrovekin û gunehkaran diyar kîn. Ew karê gelên Azerbeycanê û Ermenistanê ye. Ew ê bî xwe serederi (çareseri) li wi bikin, lê him dî Ermenistanê da him ji dî Azerbeycanê da Kurd dijin. Û ewana bêyi daxwaza xwe ketne nava vê konfliktê (pîrsgirêk), paşmayionêñ wi li ser xwe texmin dîkin, him sir û serma, him birçiti, him şehidbûna qewm-pîsmaman, him ji malêñ xwe ya wêranbûyi-kavîlbûyi. Hela serda, rewş bî obyek-tivi usa bûye, ku dikare bîqewime, iz-batiyêñ bırakujiyê ji diyarbin, ji ber ku kurd di nav herdu ordiyêñ diji hev da ji hene. Û ew sûcê wan nine, lê bed-bextiya wan e.

Hahanga pîrsa derheqa navça Kurdistanê ya bî navenda bajarê Laçin tê ber çava. Me derheqa wê yekê da gelek cara bir-baweriyêñ xwe go-tiye, herwaha pressayê da ji. Em pîstgiriya daseknandina wê navçê dîkin dî konteksta prosesêñ da-sekinandina heqîya diroki da, rastkirina neheqîyan, ku salen 30-i da hatîne kîrinê, lê em berk diji devbûna nava karê kurdêñ Azerbêca-nê ne. Riya berbi dasekinandina otonomiyê gereke bî hevrexberdan-nê aşiti be, yên bîneciyeñ wê navçeyê tevi diwana Azerbêcanê, tevi rîexistinêñ komarê yên cihê-cihê. Rêke mayin tune. Metodêñ bî desti zorê nava rewşa niha da dibe berbi hasêgehê û bendê. Ew dikare tenê bibe sebebê xwinrêtinê û mihacîrbûna bî deha hezara mihacîra. Serokatiya Pêşenîya kurdaye "Yekbûn" elam dike, ku ew ê hiç cara li riya bî çekê

safikirina problêma okruga Kurdistanê negire, nenihêri, ku ji cend aliya helan didane me wi awayi bikin.

Em dixwazin him bî azeriyan, him ji bî ermeniyan ra bî aşiti bijin. Ermenistan ji bo kurda bûye wetenê duda, yên ku dî destpêka sedsalê da xwe ji gelkujiyê parastin, lê li Azerbêcanê kurd eva çend sal e dijin. Azeri û kurd bî aşiti dijin, û wê gunehkari bûya, eger wana beri hevdu bidana. Em bî hêvikirin berbiri hukumetên Azerbêcan û Ermenistanê dibin, ku bî camêri berbiri bextê kurda bibin. Ew ne tenê pîrsa siyasi ye, lê herwaha pîrsa wijdani ye ji. Gerekê hildine ser hesêb, ku rex sinorê Ermenistanê û Azerbêcanê 30 milyon kurd dijin.

Rewşa gelê me li Gurcistanê ji bî carekê va hate sextkirinê. Ew ji wek gurcan û gelên komarê yên mayin dijwariya û bedbextiya dibine. Gelek bê kar in. Şerê bajarvaniyê, telebextra li vira ji tesira xwe ser me dihêle. Ëdi kurdên şehidbûyi û birindar hene. Em bona wê yekê berxwe dîkevin û dîlkovan in û serxweşiyê dîdine qewim-pismamê wana û berbiri serokatiya Gurcistanê dibin ku qedera kurdan kurda li Gurcistanê hildine ser hesêb. Gelê me hin bûye bî helali kar bike, her xebatê bike, heta xebata giran ji. Ji bo nebe parsekçi û kedxurê xelqê, bona xelq qedrê wê bigre. Em dixwazin wê hurmetê û peywendiyên qenc tevi wan hemû gela biparêzin, yên ku li Gurcistanê dijin. Em derc dikin, ku iro dî komarê da rêxustin û teyfayêن cihê-cihê hevdu ra ketine qal û cengê. Em hêvi dikin me kaşı nava wi şerê hunduri nekin, ji me ra dujmin ne lazım in.

Kurdên Tacikistanê ji ketîne nava rewşeke usa.

Jiyanâ kurdên Ûzbekistanê û Qırğızistanê ji bê problêm nine. Şerê dî navbera mîleta yê Fêrganayê û Oşê tesira xwe li ser her kesi hiştin. Ew ji li komarê usa da cihê ku problêma axê geleki berk e. Tişteki veşartînê nine, ku hêzên usa hene ku dixwazin xweliyê (erdê) bîdine wan kesa, yên ku

bîneciyêñ kevnare ne. Em texmin dikin, ku wê çi bîqewime, eger bî wi awayi bîbûya. Lê gerekê usa ji bêjin, ku serokatiyêñ dewletên Qırğızistanê û Ûzbekistanê piştgiriya wan hemû gelan dikin, yên ku li wir dijin. Lê carna kurd û mîletên din pev diçin. Derheqa vê yekê da em ji nama û qisêñ merivêñ ji wira hati pê dihesin.

Rûyê sebebêñ obyektiv (pîrmileti, erdê bî çapa mezin) û politika serokatiyê, bî baweriya me, hela rewşa baş li Qazaxistanê ye. Lema ji gelek malêñ kurda yên ji ci-warêñ şer lê heye, an cîguhasti Rûsyayê dibin, an ji Qazaxistanê. Hela serda, izbatî hene, gava ji Rûsyayê diçine Qazaxistanê.

Wek hûn dibinin derd-xemêñ gelê me pîr in, ji ber ku ew ketiye nava vê gêjgeringa nemithimtiyê û tevlîheviyê, ya ku iro hînkûfi hemû wargehêñ Sovyetistana berê ye. Her komare xwediyê xusûsikê ye yên siyasi û gelêriyê, û gerekê çare bibinın bona bijin, çande, ziman erf -edetên xwe biparêzin. Organeke koordinasiakirinê ya ser dereca dewletê pêwist e, ya ku bîkaribûya dema lazım da problemen gelên bî jimara xwe va bîçûk safi bikura, yên ku rûyê sinorêñ dewletên nuh da ji hev hatîne cihêkirin.

Bî hesabhildana vê yekê, hela destpêka sala 1992'a, Navenda me berbiri serokê Parlamana Fêdêrasya Rûsyayê R. İ. Xasbûlatov bû û pêşniyar kir komisyona navparlamânê saz bike ya bona problema kurda, an ji komisyonêke din ya rex komisyonâ bona problema gelên sırgûnkiri. Tê texminkirinê ku problêma kurda ne tenê problêma Rûsyayê ye, lê herwaha problêma parlamânê wan dewleta ye, li wir kurd dijin. Komisia navparlamânê wê pîrsên diha gîring lê binihêriya, yên ku iro dikarin her kunceki Sovyetistana berê da bixuliqin. Mixabin, ew pîrs hela bê bersiv maye. Em ê bicedinin, ku ew pîrs bê safikirin.

Bî kurti vi awahi ne problêmên gelê me. Ez ser wê baweriye me, ku peykarên dû min ra wê diha hûrgili,

konkrêt rewş bêli bikin, û wê demê ew ê diha ges bê ber çavê amadekarên konferansê.

Lê pîrsdaninê gelê me yên gîring iro disa hene, kijan em gerekê bî hevra safi bikin.

Beri hertiştî, pêsiya wê yekê bigrin, ku hinek dixwazin faktora oli-dini derxine ser plana pêşin. Em kurd in, ew ya here sereke ye, lê musulmani û êzdi pîrsa dereca duda ye. Din karê her meriveki şexsi ye, ew din dikare biguhêre eger bixwaze, lê ew milet i, ku bavê te, kalikê te û bapirê te ji wi ne, nikari biguhêri. Ew netewê te ye, xwina te ye, û ji wê ziyarettir hiçtıştek tuneye. Kijan mîleta dixwezin hildin- rûsa an ji almana. Dî nava rûsa da gelek ol hene. Ango mîletek e, lê çend dinê wi heye. Em êdi derheqa wê yekê da nabêjin, ku gelek mirov ne dindar in. An ji alman. Dî nav wan da him katolik, him xaçparêz, him ji nûnerên olên mayin hene. Bal gelek mîletên mayin ji awaha ye.

Hûn texmin dikin, ku wê çi bûbuya, eger ew milet bi dinê xwe bihatana naskîrinê, ango navê dinê wan navê mîletê wan bûya? Ez nimûneke nuh binum eva banzdeh sala zêdetir e, ku di İrlanda Bakur da dî navbera kato- lika û protestantan da şer dice.

Yekitiya mîlet bêyi dinhebandinê - ew riya me ya prensipiyal e. Eger em wê yekê fehm nekin, wê demê em nagihijine hiç tişteki. İdi em derheqa wê yekê da nabêjin, ku hinek kes dixwazin hinek kurdên êzdi pareveyi ser kurdan û êzdiyan bikin, ku xu- dêgiravi êzdi ne kurd in, lê mîleteki cihê ye. Em ser wê baweriyê ne, ku hinek kes bi vê yekê dilizin ji bo dax- wazîn xwe yên politiki.. Ez nizanım ew ji kê ra dest dide, lê zanım ku ne ji kurda ra. Dibe em Navenda oli ya yekti saz bikin, ku him kurdên mu- sulman, him ji yên êzdi têda kar bikurana? Em bêjin ji du kesên ruha- ni (şêx, pir, melle), ku qedirê wan di nav gel da heye. Em dixwazin derheqa vê yekê da fikra we pê bihesin.

Iro bili Navenda li Moskow, naven-

dîn kurdî hene, li Alma-Atayê, Bakûyê, Tbilisiyê. Bê şik her yek dixwaze ala gelê xwe bike. Em li ser wê baweriyê ne, ku mefa wê dina pîr bûna, eger daxwazîn me bihatana koordinasiakîrinê, yek rê bîhata ditinê-destxistinê bona safikirina problemen gelê kurd. Ew ê yekitiya me bîda mehkemkirin, bî vi awayi temamiya gelê me ji wê xwe bigihanda hev û bî tifaq bûya.

Dirokê ji me ra wek mirat qebili- esireti hiştiye. Em ê bîkarîbin wê pîrsê ji safi bikin, eger tevi nonerên eşireta berhevi ciki bibin û em bî hevra problemen xwe enene bikin û riya safikirina wan zelal bikin.

Gelek karê me yên usa hene, ku gerekê paşda neyêne êxistinê. Em ê yekê ji wana hildin kurd çawa zimanê xwe yê dê zanîn, çiqasi dîkarin bî zimanê dayka xwe bînivisin û bixûnîn. Tişteki veşartînê nine, ku pîrani zimanê peyvandinê zane, lê gelek xirab bî kurdî dixûnîn û diha xirab bînivisin. Sal bî sal ew problem diha kûr dibe, û mîlet ji çanad xwe ya dewlemend tê bîrrinê. Bî bawerîya me hereketê tevayı lazîm e bona hemû zarêr kurda bîkarîbin zimanê kurdî fîr bibin, bî kurdî bixûnîn û bînivisin. Komikêna usa gerekê li wan hemû ciya hebin, li ku kurd kompakt dijin. Ew şuxuleki hêsa nine, ew him pîrsa mamosta û pîrtûka ye, him ji pîrsa pera ye. Lî çiqasi ji dijwar nibe, em gerekê van pîrsa safi bikin, an na paşê wê geleki dereng be.

Şanoya me ya kurdî, çend komikêna sitaran û reqasê hene, lê ew geleki hindik e bona mirata çanda me bê parastinê û pêşda here. Em gerekê tişteki sedi sed bizanibin, li ciyên ku çend malê kurda dijin, dîkarin komikêna kurda yên sitaranê, reqasê, yên ezberbêjiyê bêne sazkirinê. Bî gîlikî, navenda çandi ya biçûk, ku li wir meriv bî çanda xwe ra bibine nas.

Dî nava kurda da roşinbirên zane gelek in - zanyar, niviskar, wênekêş, sazbend, karkirên şanoyê, bizisk. Lî disa ji em hatîne bawerkirinê, ew pîrs guhdariya herdemi dixwaze. Me ce-

dand xwendina lawê xwe li fakültéta beriamadekirinê, ya ûniversitêta S. Pêtersburgê da bîdine tişkirkirinê. Lê, çi mixabin, ku ewana rind hin nebûn, lema ji gîşk neketine ûniversitêtê. Îsal me hinek pere cihê kiriye bona heqê xwendina wan kurda bidin, yên ku li idarêن xwendina bîlind da dixûnin. Piraniya wan institûta yûristiyê da nin. Lê ez gerekê xwe mu-kur bêm, ku ev gîşk perên mezin û teşkildariyê dixwazin, him ji aliyê Navenda me da, him ji ji aliyê dê û bava da.

Çi ji hebe, eger em diwazin derheqa paşeroja gelê xwe da bifikirin, gerekê kadroyênil milet bîdine amadekirinê.

Dî konfîransa buhuri da, beri sale-kê, pêşniyar hate kîrinê. Pêşengiya kurda ya "Yekbûn" bikine parti- bi qanûnname û bernama xwe va. Werin em derheqa vê pîrsê da baweriya xwe bêjîn.

Van paşdema idêa derbazkîrîna kongrêya kurda da (an ji ya olkêñ kurda) yên wan dewleta da geleki tê xeberdanê, ku ser erdê Soviêtistana berê xuluqineb Jî bo nînmûnê, van dawiya kongrêke usa huruma (grêka-yûnaniya) li Moskow dane derbazkîrînê. Dibe ku lazim e em ji rind hazır bin û sala tê wê kongrê derbazkîn, bona milet bigîhinin hev, sistema alikarikîrîna wê ya civaki, çandi û ya maf hazirkîn.

Kurt goti, her pîrsek yekitiyê, piştgîriyê dixwaze. Tiştek zelal e, ku tenê olka kurda ya rind teşkilkiri û hevgirti dîkare ser erdê Soviêtistana berê bibe hêzeke baş û bona her kurdeki bibe delil.

Têkoşîna gelê Kurdistanê ya bona serxwebûnê li İraqê û Turkiyê ketiye dereceke gîring. Hûn zannin, ku li wira rewş ewqas ji baş nine. Ne tenê Saddam Huseyn û Turgut Özal derketîne diji kurda, lê herweha dijitiya kurda ya dî navbera hevda bûye qesassê serê gel. Eva serkaniya hemû bedbextiyêne me ye. Dewletên Roavayê, û beri her tişti emîrkan dixwazin kurda li Rohîlata Nêzik bikine desmala ser

desta. Kê alikariya wan dike, dêmek dijmînayı ji gelê xwe ra dike. Em şerê birakuştinê gunehkar dîkin. Em dijwariyê komara kurda ya li İraqê tê dîgîhîjin - hesarkîrin (blokada), xelayi û.hwd. lê tu tuşt nikare şerê kurda yê diji hev efû bîke.

Me her cara gotiye û dîbêjîn, ku em diji terorizmê ne, lê ew nayê wê menê, ku em diji tevgera gelêri ya azadiyê ne. Bêy têkoşîna xweş tuneye. Tişteki mayin e, ku şerkari bi çi awayi û metoda dîki.

Van paşdema rewşekî nuh hatiye sazkîrînê. Jî İraqê gelek mîhacîr ser riya Tîrkiyê û Azerbêcanê derbazi Moskow bûne. Hinek hêzan li wê mintiqê deng bela kîrine, ku ji hemûyan baştır û ji hemûyan hêsatır bi vê rê dîkarîn derbazi Roavayê bibin. Merv têñ û dîkevine telikê. Jî ber ku hiç welatek wana qebûl nake. Em bi nama berbiri çend baylozxa-nen welatên Awropayê bûne, ku alikariya xelqên hati bikin, lê hetani niha bersiv tune. Xuyani ye, jîneke kurd ya jî İraqê rast got: welatên der-eke, ku xwedi-xudantiyê li Kurdistanê dîkin, dixwazin Kurdistanâ bêy kur-dan bibinîn.

Tê kîvşê, sur dî vê yekê da ne - bi her awayi kurda ji welatê wan raqetinin.

Em berk diji politika usa nin.

Kurdên Sovietê gerekê hevgirti Hu bî tîfaq bin, wê demê em ê bikarîbin diha baş alikariya welatê kal û bava - Kurdistanê bikin. Ne axir torin û nebiyên wê, wê dî Kurdistanâ azad da bijin. Gelê kurda yê 30 milionê wê bibe xwediyê welatê xwe. Em bi wê yekê bawer dîkin û ew baweri ali me dike bijin û berxwe bîdin.

### Tajdin Bîroyêv

Serokê giştî yê Navenda çanda kurdiye Navnetewi li Moskow.



# Dî muzika folklori da şertên lêkolinê

Eshed Muhammed Ali

Kar û xebatên ilmê muzikê yê etimolojik lêkolina materyalêni muziki yên xam û rengêni wê, cîvandîna wê, nîvisandin û analiza û zanebûna metod û rengêni wê dide xuyan. Pîstre lêkolina pêwendiyêni wê bi kulturek taybeti ra û tesira ku dî navbera wan da peyda dibe dide xuyan. Bi gisti, lêkolîn dî muzika folklori da, derbari muzikê da zanebûnek tam dîvê, teori û teknik dîvê û herweha dîvê li ba lêkolinvan li ser karê lêkolinvani yê meydani zanebûnek xurt hebe û pêra ji navgin, metod û pîsporiyêni pêwist.

Kort Saxz, dî praktikê da du pengavêni babetâ lêkolina muzika folklori destnişan dike: (Theori and method in ethnomusicology, Bruno Nettel, rûp: 62)

1- Cîvandîna materyalan ji çavkaniyêni wan (field work)

2- Karê ku li dezgehê (desk work) ji nîvisandin, analiz, danberhev û tesbitê pêk tê.

Bi van herdu pengavan ra, ji bo bicihanina encamêni rast pêwist e ku şertê praktiki û teorik bi lêkolinvan ra hebe. "xwendîna dirok û rewşa grûba ku lêkolinvan dîce ziyaretiya wan" (Eyni çavkani, rûp: 8) pêwist e. Dîvê lêkolinvan derbari lêkolina folklori ya hazır, tore, destan û çirokan zana be. Ev tiştêni han

alikariya lêkolinvan dike ku karîbe jiyan û xisûsiyetêni grûbê ya cîvaki têbîgîhije û bi gisti nêzikayı bi sıruşta muzika wê grûbê biye. Ü bi vi awayi lêkolinvan, kare bi hêsanî bingeha muzika grûbê têbîgîhije. Dî pengava (periyod)duduya da, lêkolinvan, awazêni ku pîr bi balkêsi guhdari kîriye, bi usûla nîvisandinâ notaaya muziki dînivise. Karê tesbitkîriña rîgeza (element, unsur) hemû cûre muzik, baweri bi rengê nîvisandinê û lêhatîna awazan, yên ku berê hatîne dagirtin, tine. Bo vê yekê zanyarêni muzikê, riya pêwistiya gîhiştîna wan nîvisandinêni rast û dîrust saxlem dîkin û alikariyê dîdîn ku meriv bigîhije wan dokumentêni huneri yê ras-teqin.

Dî muzika folklori da, dî navbera lêkolîn û dem da têkiliyek heye. Lezandîna cîvandîna awazan û qeydkîriña wan yek ji şertên bingehin e ku meriv bigîhije komike mezîn a materyalêni folklori yê ras-teqin. Ji ber ku bêkêri, tembeli û ihmâl dibe sedemê windabûna awazêni esil. Herweha şertêni jiyana cîvaki ya ku tê guhurin ji, tesirek li ser wan rîgezêni awazan dike û ew awazêni han dîkevin ber çerxa guhurinê û pêşveçûna ku ji fîrehbûna serdemê derdikeve, lewra mumkun e ku jiyana cîvaki ya bajêr der-

basi gund bibe, ji ber ku navginê qeydkirinê, wek radyo û hwd, bi hêsanî rê vedike ku meriv stranê nîvisandi û nenîvisandi yên bajaran, yên ku tesirek direk û indirek li ser asaleta folklor dikin, guhdari bîke. Ji ber vê yekê lêkolinvan şiretê dikin, ku rojek zûtir stran, awaz û reqsên folklorik bêne cîvandin, lewra tîrsa wan ji guhurinekê ye. Ji bo vê yekê hunermendêñ welatêñ pêşketi, vê pîrsê gelek gîring ditîne û li ser cîvandin materyalêñ folklori xebitine da ku ji bîngehê eslê wan materyalêñ folklori bi dest xin. Ev karêñ han, berê bi awayeki şexsi dihatin cîvandin, lê piştre ev kar bû kareki giştî, bi taybeti (beri 50 sal) di welatêñ sosyalist da. Ev karê han ji bo ihtiyacêñ lêkolinvan roleke pîr gîring leyistiye da ku karibe ji bo vi kari kadro hazır bîke û imkana maddi ya pêwist amade bîke, ku kadro karibin bi van imkanan ji bo cîvandin materyalêñ folklori bigerin.

Lê heta ku cîvandin awaz û qeydkirina wan pêk hat, di hîn welatan da karê cîvandin û lêkolinê wexteki dûr û dîrêj girt. Koday û Partok cara yekem di çaryeka Sedsala bistan da derketine û ji bo cîvandin materyalêñ folklori geriyane û ev xebata wan ji ali lêkolinvanêñ hevdem yên Macari tê berdewam kîrin. Armanca lêkolinvanêñ Macari ew e ku, bigihijin gelek rengêñ cûre yên muzika folklori û materyalêñ awazan, ên ku Partok û Koday bi dest nexistibûn, ji bo ku rê û metodêñ bi program yên nûjen ava bikin û di usûla tesbitkirina çavkaniya muzika folklori da bigihijin encamêñ gelempere yên heri bi diqqat. Bêguman ev, periyodeke pêşketi û gelek modern e, lê dîvê ku du periyodêñ pêwist, yên ku em ê nîha behsa wan bikin, pêşkevin heta ku em bigihijin navginêñ ilmi û bi ci rengi bikaranina wan:

#### Pengava Yekem:

Weha pêk tê:

#### 1- Cîvandin (Collection)

Lî vê derê pêşxebata lêkokinê tê kîrin. Dî vi kari da şertêñ bi taybeti yên ku meriv diğihine encamek bi diqat tê pêş û dîvê meriv vana bîde ber çav. Şertê yekemin ew e ku, navçeya cîvandinâ stran û awazan bête tesbit kîrin. Gîringiyekî taybeti ji bo vê tesbita han heye, ku ew ji rengdêrêñ materyalêñ muziki yên ku wê bêñ qeydkirin kîfş dike. Ji ber ku navçeyeji hev tê cihékirin, wek navçeyen bakûr, başûr, rojava û rojhîlat. Her navçeyek xwedi xusûsiyeteki ye. Disa her navçeyek wek dever ji tê beşkirin, ango navçeye bi xwe li gor deveran tê beşkirin. Her devereck, ji bo binavkirina rengeki taybeti yê stranan, xwedi roleki ye. Minak: stranêñ kar, stranêñ cotkaran, stranêñ zarakan, stranêñ şahi û seremoniyêñ dini û dînyayı.

Beri ku em dest bi gava duduya bikin (ango qeydkirin an ji teybkirin), dîvê em grûb an ji kesêñ ku eyni reng stranan dîstrêñ tesbit bikin. Ew grûb an ji kesêñ stranbêj ên ku têñ hîlbijartîn, çêtir e ku ji xeyni sırûşta gunditi neketibin bin bandora sırûşteki dîn û bi emîr bin. Hîn lêkolinvan hene ku, di dereca yekem da bala xwe dîdin ser pirekên bi emîr, lewra li ba wan pirekên bi emîr hîn awazêñ esil dîminin an ji peyda dîbin. Ji ber ku pirek di cîvata girti da ne û pîri caran di wê cîvatê da dîminin û toreyêñ ku ji nîşekî derbasi nîşekî dîn dîbin li ba xwe dîparêzin. Lê gava lêkolinvan li stranêñ serbori û şeran bigerin, zîlam çêtir in.

Kesê ku materyalan dîcîvine, dîvê lêkolin ku berê li wi navçeyê karê cîvandinê kîriye nas bîke, ji bili viya eger di pîrtûkxane û arşivêñ muziki da ji wi navçeyê materyal hebin, wana ji zanibe ku karê cîvandinê neyê dubarekirin.

#### 2- Qeyd kîrin (rekording).

Ji bo vi kari dîvê lêkolinvan naveroka strana folklori baş nas kîribe. Herweha xusûsiyeten wê yên gelempere yên ku strana folklori ji yên dîn cuda dike

bızanibe da ku karibe strana folklori ji stranên din ên ku rast lê tê ji hev veqetine.

Ji bo karê qeydkirinê hin navgin pêwist in. Minak: Teyb, defter ku hin agahdari li ser dengbêj bête nîvisandin, wek temen, cinsiyet û hin agahdari li ser jiyana dengbêj, kijan reng stranan distirê û kijan reng stranan hez dîke, kijan instrumenten muziki lêdixe, bi xwe helbest û awazan çê dîke yan na, ew stranê ku bi dengê wi tê teybkirin li ku derê fêr bûye, ew merivê ku jê fêr bûye gelo ji kijan sıruşti ye û hwd. Herweha di defterê da tarix û cihê qeydkirinê tê nîvisandin ligel nav û tekste stranê. Divê defter xane bi xane xetkiri be ku agahdariyên jorin bi hêsanî bêne nîvisandin û ji hev bênen kifşkirin.

Şêweya pêwendî dîgel dengbêj pîrgiring e û pêwist e ku ji dengbêj ra atmosferik wîsa bête peyda kîrin da ku baweriya wi pê bê û karibe bi hêsanî û bi rengeki sıruşti bistirê. Divê em bala xwe ji bîdinê ka dengbêj bê heyecan û di atmosfera pêwist da distirê yan na.

Feyda teybkirine gelek mezin e, lewra teksta stranê dîgel awazê bi balkêsi qeyd dîke. Herweha baştir e ku tekste stranê di defterê da, di dema teybkirinê da bête nîvisandin. Feyda wi tîstê ew e ku, tekst li gor qalibê awazê bête tesbit kîrin. Pişti her straneki qeydkiri em nota LA (bi Kamerton) teyb dikin, ji bo : 1- Naskırına tonê esasi (tonality) yê ku dengbêj li ser stranê dibêje, danberheva wi bi tona LA ra. 2- Dema ku em eyni stranê di teybeki din da guhdari dikin, divê em tona LA bîdin ber tona LA ya Kamertonê û ferqiya navbera wan kifş bikin da ku tona orijinal ya ku stran pê hatîye gotin wînda nebe. 3- Tona LA li dawiya her strani dîbe wek veqeteket di navbera stranê qeydkiri da.

Hin caran lêkolinvan di dema qeydkirinê da mecbûr dîbe ku tonek munasib ji bo dengbêj hîlbijêre (dîbe ku dengbêj toneki şas an ji ne mulahim ji

bo avahi û firehbûna stranê ra hîlbijêre). Li vê derê feyda zanebûna lêkolinvan di warê rengê stranan, bîhayiya wan a folklori û sıruşta wan ew e ku, bîkaribe tonê munasib ji dengbêj ra destnişan bîke, lewra dengbêj kare bêhemdê xwe tonek şas hîlbijêre.

Gelek caran eyni strana folklori bi çend şêweyên cuda têne gotin. Ji ber vê yekê heta ji meriv bê, çêtir e ku eyni stran bi dengê dengbêjên cuda û li navçeyên cihê bêne qeydkirin. Û di dema karê danberhevê da, şêwe û rengê esli kijane bîdin xuyan.

Eger em parçeyek instrumental (Instrumental music) qeyd bikin, çêtir e ku sazbend bi nota esasi ya ku instrumenta xwe pê akord dîke ji me ra lêxe û em ji her wi toni qeyd bikin. Herweha em ê di deftera xwe da ji, navê instrumenta sazbend, wek ku ew bi nav dîke, bînîvisin.

### Pengava Duyem

Ji van periyodan pêk tê:

1- Nîvisandina musiki (Transcription) : Ev xebat û yê li dû li ser dezgehê tê bi cih anin. Ew cihê ku navginê kar ên nîvisandina muziki û yd. lê hene, wek: Guhdank (headfon), dema ku di odayekî da çend kes eyni kari bikin pêwist e. Herweha carna pêwisti bi piyano ji heye.

Wek ku Bartok dibêje, nîvisandin "heta ji dest bê bila rast be", (Serbo-Croatian folk Songs, Bartok Bela, rûp: 3) tevi ku belavkirina awazên folklori, pêwistiya nîvisandina wan bi tonen esasi yê ku pê hatîne gotin û lêxistin tine pêşberi me ji, lê di praktikê da ji bo hêsanırına nîvisandinê çêtir e ku awaz (transposition) bîşinin ser toneki kifşkiri (pitch). Ü herweha ji bo her awazek tonek gelemeperi yê kutabûnê bîdin (final ton). Bi vi kari em du feyde bi dest dixin:

a) Nîvisandinek hêsan. b) Di nav hundirê grûbeki taybeti yê awazan da, em karin bi hêsanî têkiliya navbera du

awazan bîdîn diyar kîrîn. Lî gor ditîna Bartok, nota SOL (G) jî bo gîhiştîna encama van herdu feydeyan bî kîr e û di cih da ye. (Eyni çavkani, rûp: 27)

Hîn pêşniyar jî bo karê nîvisandîna muziki

(Theory and method in ethnomusikology, Bruno Nettel, rûp: 119-120)

a) Jî bo materyalê qeydkiri guhdariyek bî baldayin dîkîn, ligel xwendîna hemû nîvisarêن qeydkiri yêن lî ser wi materyali û dî vê navberê da hejmara dengbêj û instrumentêن qeydkiri tesbit dîkîn û awaz dînivisin.

b) Tempoya teybê kêm bikin binin nîvî û cardîn eyni awazê bî balkêshi guhdari bikin, ku bînihêrin ka çîqas bî baldayin hatîye nîvisandin.

c) Cardîn bî tempoya orijinal guhdari dîkîn û ew tiştê ku me nîvisiye raçav dîkîn jî bo ku şaşitiyek çênebe.

d) Pişti vi kari em karîn derbasi materyalek dîn bîbin.

Hîn işaretêن ku dî nîvisandîna muziki da wek navgin têن bî kar anîn hene û ew nişanêن han jî bo tesbitkirîna elementêن muzika folklori dî pîraniya çavkaniyêن akademik da têن bî kar anîn.

İşaret:

Gava em ev işareteta han lî ser notayek bî cih dîkîn, tê wê manê ku dengê ku dengbêj ew nota pê xwendîye bî qasi nîvtoneki jî yê nîvisandi bîlîndtir dîbe.

Tê wê manê ku, dengbêj ew nota ku ev işaret lî bîn nîvisandi bî qasi nîvtonek nîzîmtîr gotiye.

Eger ev herdu işaretêن han lî kîlekê hatîbe nîvisandin, tê wê manê ku dî hemû awazê da ew nota ya nîvtonek bîlîndtir an ji nîvtonek kîmtîr hatîye xwendîn. Lî eger dî awazê da tenê lî ci-heki notayek hatîbe guhartîn, em tenê lî

ser wê nota han tirek datînîn (eger nota guhartî nîzîm be, tir serejêr e; na eger bîlînd be, serejor tê danin).

Eger nota dî nav parantêz da be ( ), tê wê manê yê ku ew nota nîvisiye jê ne emin e û dîbe ku ew nota ne rast be.

Notayek nexşkîrinê xwedi demeki pîr kurt e (grace note)

Notayek ku dengê wê gelek qels e.

Bî şêweyek çaplûka jî notayek derbasi notayek dîn dîbe (Glissando)

Herdu nota bî hev va gîrêdayi ne (Legato).

Notayek dîrêj (dîrêjkiri) bê jîhevveqetandînek rast.

Dema notaya rast jî ya nîvisandi dîrêjtir e.

Dema notaya rast jî ya nîvisandi kurttir e.

## 2 - Analizkirin (Analysis) :

Wek ku tê zanîn her awazek nîvisandi jî element û pivanêن huneri yên gelemeperi û hevpar pêk tê. Û lêkolinvan dîkare lî gor metodê analiz ê naskiri û yê tê bîkaranîn wan jî hev cuda û analiz bîke. Ev metodênen han bê istisna lî ser hemû elementêen muzikê têن bî kar anîn. Ew element û pivanêن huneri ev in :

- a) Vegetekên parçeyan (Cadences)
- b) Avahi (Structure)
- c) Mecala (fîrehbûna) dengi (Range)
- d) Şêwe (style)
- e) Parçeyen dengi (Syllables)
- f) Ritm (Rhythm)
- g) Pêpelîng an jî maqam (Scale)

## Şirovekîrîna xalêñ jorin

### a) Veqetekê parçeyan (Cadences) :

Têkiliyek sıruşti dî navbera dîrêjbûna parçeya muziki û naveroka tekstê wê da heye. Parçe wek xetê muziki tê bî nav kîrin (line). Gotinê wê parçê wek (text) tê bî nav kîrin. Dawiya her xeteki muziki lî gor bîlîndbûna wê ya dengi (Pitch) tê tesbit kîrin, yê ku herweha rengê sekna wê yê ku wek veqetek (Cadence) tê bî nav kîrin tesbit dîke. Bî vi rengi em dîkarin hejmar û rengê her veqetekeki lî gor bîlîndbûn û nîzîmbûna wi dengi nas bikin, çi lî ser dereca yekem (tonic) çi lî ya pêncan (dominant) çi ji ya çaran (sub-dominant) û hwd... Bîlîndbûna her veqetekeki lî dawiya her xeteki muziki, bî vi rengi tê nîvisandîn û ji çeperast tê xwendin. 1 4 5 1

Ev hejmarên han ên ku wek minak hatîne dayin, dîdîn xuyan ku awaza nîvisandi ji çar xetan pêk tê : Xeta yekem lî ser notaya bîngehin (tonic) dîqede; yê duyem lî ser nota çara (sub-dominant) dîqede; yê sisiyan lî ser dereca pêncan a ku bî navê (dominant) tê naskîrin dîqede. Xeta dawi cardîn vedigere ser notaya bîngehin. Bî gelemperi metoda ku bêtir tê xebitandin ew e ku, bîlîndbûna dereca dawi ya awazê nayê nîvisandîn, ji ber ku weha hatîye naskîrin ango piraniya awazîn folklori bî notaya bîngehi dîqedin.

### b) Avahi (Structur)

Bî riya xetêñ awazi, ango hevokêñ awazi yan ji parçeyêñ wê dîkarin avahi nas bikin. Herweha lî ser bîngeha nave-roka her xeteki û şeweyêñ awazi yên ku dî hundîrê her xeteki da ne, yên ku bî û işaretêñ jêt tê tesbit kiri:

(A A) Tê wê manê ku awaz ji du xetêñ wek hev pêk tê.

(A A7) Tê wê manê ku awaz ji du xetan pêk tê. Xeta yekem ji yê duduyan

hînek cuda ye.

(A B A) Ev tipêñ han, tê wê manê ku awaz ji sê xetan pêk tê. Yê yekem û sîyem wek hev in, lê yê duduyan (B) ji wan cuda ye.

Awaz dîkare ji gelek xetan pêk bê. Minak : (A B A C A), tê wê manê ku awaz dî dawiyê da hertim vedigere ser xeta yekem (A). (Ev tipêñ han wek Rondo tê bî nav kîrin, wergervan) Bî gelemperi ev tipêñ awazan dî stranêñ folklorida gelekkêm in.

### c) Mecala (fîrehbûna) dengi (Range)

Nota heri nîzîm û nota heri bîlînd bî du reqem tê ûşaretkîrin û dî navbera wan da xetek (I-VI) tê danin. Mebesta I, dereca bîngehin e û VI bîlîndtîrin dereca deng ê ku awaz dîghê, diyar dîke. (Minak : Eger awaz bî maqamîn (scale) DO major be, I tê mana dereca DO û VI ji tê mana dereca LA, wergervan)

### d) Şêwe (style)

Naskîrina şêwe, pevgirêdanek xwe yê bîngehin bî rîveçûna awazê ra heye, çi awaz ji notayek nîzîm dest pê bîke û berbijor hîlkîşe û piştîre dakeve notaya destpêkê, çi ji awaz bî notayek bîlînd dest pê bîke û berbijêr dakeve notaya nîzîm. Bî vê metodê Koday û Bartok ji bo stranêñ folklori yên Macari du şêwe tesbit kîrine. Şêweya yekem, şêweya kevn e, stran bî notayek bîlînd dest pê dîke û lî ser notaya bîngehin a nîzîm dîqede. Şêweya duyem, nûdem e, stran ji notayek dest pê dîke û hîldikşê jor û piştîre ji dadîkeve ser notaya bîngehin. Rengê stranêñ folklori yên Mîsri yên populer, lî gor lêkolina mamoste Borsai Ilona ya ku dî 1970 da belav kîr ("Melody types of Egyptian wedding songs, Borsai Ilona and Margret toth, rûp: 72") pirani şêweya duduuya ye. Şêweyêñ ku lî vê derê tê behskîrin, nimûne ne ku lî gor usûlêñ akademik lî ser wan lêkolîn

hatine çêkirin û hatine analiz kîrin û  
hatine belav kîrin....(1)

#### e) Parçeyên dengi (Syllables)

Wek parçeyên dengi yên ku dî nav her  
xeteki muziki da ne têr naskırın. Lî ser  
notayê hejmara parçeyên ku her xetek ji  
wan pêk tê, tê nîvisin : 4, 8, 4

Ev reqemên han dîdîn xuyan ku, xeta  
yekem ji çar parçeyan pêk tê; xeta duym  
ji heştan û xeta şeyem ji ji çaran pêk  
tê.

#### f) Ritm (Rytm)

Eger hemû xetêr muziki lî ser yek ritmi  
hatibin avakîrin, bêyi tu guhartînek, wê  
çaxê lî ser nota em terma (Isorhythmic)  
dînîvisin. Lî eger her xetek lî ser ritmek  
bî serê xwe

hatibe awakîrin, lî ser nota em terma  
(heterorhythmic) dînîvisin .

Eger hejmara parçen dengi yên her xeteki  
wek hev bin (syllable) em lî ser nota  
(Isometric) dînîvisin.Lî heger hejmara  
wan ne wek hev bin em lî ser nota (hetero  
metric) dînîvisin .

#### G) Pêpelîng an ji maqam (scale)

Ew yek ji elementên huneri yê ku awaz  
ji wan pê tê ye, yan ji ew yek ji bingehê  
ku muzikek taybeti lî serê tê avakîrin.  
Dibe ku muzika me ya folklori lî ser gelek  
pêpelîngan hatibe avakîrin. Ango ew  
pêpelîngê (diatonic) ên ku ji yekton û  
nivton û sêribton ava dibe. Ji ber vê  
yekê çêtir e ku em navê pêpelîng (maq  
am) lî ser nota bînîvisin, bî taybeti ew  
maqamên me yên ku sêribton dî wan  
hene xwedi gelek navêr cuda ne.

#### Xwendîna danberheviyê (Comparative Study)

Ev xwendîn xwedi du pengavan e:

1- Danberheva bîlîndahi (Vertical Com  
parasion) : Ew materyalên ku dî welateki

yan ji navçeyeke taybeti hatine cîvandîn  
dîdîn ber hev da ku cudabûna tipê  
awazan û naskırına karekterên wan ji  
hev derxîn. Ew tip ji ev in :

- Stranêr folklori
- Stranêr gelêri yên ku bî şêweya stra  
nêr folklori hatine çêkirin.
- Stranêr çêkiri (Komposod)
- Stranê qatêr burjûvazi

#### 2- Danberheva asoyi (horizontal Com parasion)

Elementên muzika (taybeti) welateki bî  
yêr welatêr ciran an ji welatêr ku pê  
wendiyêr wan ên diroki bî hev ra hene,  
dîkevin danberhevê ji bo ku xisûsiyet û  
şêweyêr huneri bêne kifskîrin. Bartok lî  
ser vi mijari gelek sekîniye û ji ber vê  
yekê ji muzika Sîrbêr Yugoslavi, Roma  
ni, Tîrki û ya Cezayiri xwendîye. Û weha  
dîgot: "Bêyi naskırına muzika folklori ya  
gelêr ciran û gelêr ku pêwendiyêr xwe  
yêr diroki bî Macaristan ra hebûn,  
nîkarin muzika Macari nas bikin."  
("Selected Weritings of Koday," rûp:  
104) Bartok guhê xwe gelek daye  
zimanê mîletêr ku muzika wan xwen  
diye, "ji ber wê yekê xwe fêri zimanê Ro  
mani, Tîrki, Rûsi û Erebi kîriye." (Eyni  
çavkani, rûp: 104) Ji bo naskırına  
xisûsiyet û sıruşta jiyana wan. Ev tişt ge  
lek alikariya lêkolinêr wi yên giranbîha  
kîr.

Pîr pêwist e ku em muzika gelêr dorhê  
la xwe bixweynin. Ev ji pengaveke ku  
pişti pengava xwendîna muzika me tê. Ji  
bo ku em karibin elementên muzika  
bîdestxîsti rûbari hev bikin da ku em  
xisûsiyetêr muzika xwe yê folklori tesbit  
bikin.

**Werger : Xoşnav û A. Gernas**



# Dı festivala navnetewi da filmeke kurdi:

## "TONEL"

Lı Moskovayê dı Festivala Navnetewi ya 18'an da filma kurdi "TONEL" ji  
beşdar bû û rexneyên baş wergirt.  
Rejisör û senaristê kurd Mahdi  
UMED, bı filma xwe bala gelek rex-  
negîrên sinemayê kişand. Umed ji  
Kurdistan'a Başûr, ji ba-jarê  
Kerkükê ye. "TONEL" (tunel), filma  
wi ya yekemin e.

Dı van demêñ dawi da lı Moskovayê  
Festivala Navnetewi ya Film a 18'an  
ji nû va bal kişand ser xwe. Çima ji  
nû va? Jı ber ku piştî helweşina sis-  
tema sovyetê, xebatêñ kulturi, spor,  
film û hwd. gelek sist bûbûn û his û  
deng hatibû birin. Loma meriv dikare  
bêje ku ev festival, piştî helweşina  
sistema sosyalist çalakiyeke yekem e  
ku lı Moskovayê hate pêşkêş kırın.

Lı gor agahdariya rojnamevanê Swêdi  
Leif Sörman, dı vê festivala navnetewi  
da jı 20 welatan 22 filmên bijare  
besdari lecê bûne. Juriya festivalê ji  
5 şanoger an ji listkvanê sinemayê û  
bı qasi hejmara welatan rejisör pêk  
hatiye. Serokatiya juriyê ji, rejisörê  
Fransız ê navdar Claude Leouch bûye.


Rojnamevan Leif Sörman lı ser çend  
filmên heri populer û balkêş dîsekine  
û derbari naveroka wan filmên bijare  
da şirovekirina xwe pêşkêş dike. Dı

nîvisarê da ya ku zêtir bala me dikşî-  
ne û şanaziyê dide me, şirovekirina  
filmeke Kurdi ye, ku nîviskar zêtir lı  
ser wê filmê şirovekirin kîriye.

Senarist û rejisörê filma Kurdi, bı  
filma "TONEL" (Tunel) ango be  
berhemâ xwe ya yekem bı dêwêñ sin-  
emayê yê dînê ra ketiye lecêl.. Lê ge-  
lek balkêş e ku, ew dı vê lecê da bı ser  
ketiye, baleke mezîn kişandîye ser  
xwe û filma "Tonel".

Rejisör û senaristê filma "Tonel",  
MAHDÎ UMED e. Ew jı bajarê Kerkükê  
ye. Demeke dûr dîrêj lı Sovyetê maye  
û lı Moskovayê Zanineha Bîlind a  
Film qedandiye. Ev zanineh (VGIK),  
xwedi itibareke mezîn e lı dînê. Dı  
sala 1988'an da wek penabereki Kurd  
ê siyasi hatiye Swêd. Filma Tunel bı  
alikariya Fonda Kurdistanê hatiye  
çêkîrin.

Piştî vê kurtenasinê, ka em cih bîdin





ditinên Leif Sörman:

"Lı vê derê mîn tişteki ecêbmayı kîfş kîr û dit ku, sinamatografiyeke nû peyda dîbe: Sinametografiya Kurdi. Ev ji bo rejisor û senaristê filma "Tunel" Mahdi Umed, berhemeke yekem e ku bî hevkariya produksiyona Kurdi-Taciki, bî navê Tunel beşdari festivaleke weha cihani dîbe. Anglo di tarixê da filma pêşin a fermi û Kurdistanî ye.

Tunel, filmeke ecêb e (di mana bal-kêş da) û rê nade ku ew di nav kategoriya klasik da bête bî cih kîrin. Di filmê da trajediya Kurdi ya kevn, li ser bîngeha mitolojiya Indoewrûpi ya Zerdeşti dikeve formeki ku hej ji di nav Kuda da diji û ev mitoloji ji gelek aliyan va wek Asatroyê Vikinga ye.

Di filmê da bî awayeki werimandi dijwariya duseri ya gelempéri ya mîrovatiyê tê pêşkêş kîrin û li ser bîngeha êş û janêñ neteweya Kurd apenaberi, şerê berxwedanê ya li hember işgalan û serxwebûna ku bî dereceya heri bîlind qeyd û lelekiri wek navçeya qedexe ya bakûrê Iraqê pêşkêş dike.

Di filmê da mitoloji û rasti, afîrandına xeyali û dokumenta dramatik, lîrik (şîr) û siyaset bî hevra bî metod û zirekiyeke heri bîlind têñ hunandîn.

Piştî festivalê, dema ku mîn û Mahdi Umed hevdu li studyoya Mosfilm a Moskovayê dit :

- Ez ji siyasetê nefret dikim, lê her tişt bî siyasetê va girêdayi ye; rasti ewha ye, digot Mahdi Umed.

Beşek ji filmê li tuneleki derbas dîbe, li vê derê insan di jiyaneki bêçare da ne û nikarin ji tunelê derên der. Lî dawiya tunelê avek bî hemû pisiyêni siyasi yên dinê dîherike. Film bî Kurdi bî awayeki vekiri, li bakûrê Iraq (Kurdistana Başûr) serdestiya Yekitiya Miletan dide xuyan. Û herweha rojekî ji bo pîrsiyari delagasyonek, ku ji yekitiya mamûrên dînyayê pêkhatiye, têñ ziyaretiya tunelê.

Eger Institutuya Film a Swêdi projeya Mahdi Umed paşda venegeranda, filma TUNEL karîbû wek produksiyona şîrik a Kurdi-Swêdi beşdar bîbûya."

## BAWERİYA KEVN A PERSAN

### **4- ZARATHUSTRA (ZERDEŞT)**

(Dûmahik ji hejmara 37-an)

**Wergêr: Y. Çakmak & A. Gernas**

Em, hemû ev tiştên hanê dî ayetên GATHA yên AVESTA da, ku reformên Zerdeşt in, dîbinin. Niha ji, em ê lî ser Zerdeşt ango pêxemberê MAZDA û kiryarêni wi bisckinîn.

Jiyana wi yê bî êş û cefa tê zanin. Ew kêmzêde B.I. 700 i da jiya. Dî serdemên piştre da li ser hebûna wi yê sersıruşti, nivxwedayı û zanyari gelek çirok hatin gotin û gerandin. Wek sırıstu dî rastiyê da êş û derdên ku wi dî tarixê da kışandiye zêtir dî nivsarêni piştî serdema AVESTA da têni xuyan.

Em hinek ji wan çirokan ji mêj va dî Avesta bî xwe da dixwinin. Çiroka ku, Zerdeşt dizixtine Şeytan\* ji, dî nav vana da ye.

Ahrimanê ku ji bakûra heri dûr ê cihê cehnimê tê, ku bernavkê wi "yê bî pîrmîn\*\*" e, ji bo kuştina Zerdeşt "druj"ek an ji melayketeki mîrinê dişine.

Lê dema ku pêxember dua xwe ya piroz dixweyne, melayketê mîrinê ji ber qewet û hêza van gotinan direve û xeber dide Ahriman: "Jiyana Zerdeşt dadmend (bî edalet) a payebilind li min zêde gîran tê, kuştina wi ji qewe ta min der e, ji bo kuştina wi tu rîyek nikarim bibinim." Niha Zerdeşt li hember Ahriman şer êlan dike. Heta ku rizgarvanê dînyayê (yê ku dînyayê ji gunehan û encamên wan rizgar bike) SAOSYANT dî sibeheki zemanek nû da li rojhîlat derê meydanê, ji bo rûxandina hukmê

seytan û afirandiyêni wan, wê li hember wan têkoşin bîde, dibêje Zerdeşt. Wê hîngê ji nişkava AHRIMAN ditirse û dest bi lavayiya dîke û dî eyni wextê da wi (Zerdeşt) diceribine\*\*\* : "Zerdeşte bî edalet, çêbûna min xira neke! Dev ji sonda xwe ya baweriya MAZDAya baş berde! Ji bona viya bila hukmdariya dînyayê ji te ra be." Lê Zerdeşt dev jê bernade: " Ez, jiyan û zanebûn nemine ji, tu car dev ji sonda wê baweriya baş bernadim", dibêje.

Ev bî maneyeki din derbari reformistê dinê MAZDA da, derbari bawermendi û têkoşina wi ya mîrxasi da raçaviyeke rast dide. Lê wek me li jor ji got, tiştê ku em derbari çiroka wi ya rasti û rewşa serdema wi da dixwazin hin bibin dî stranêni GATHA da ne û divê em dî wan ayetan da lê bigerin. Dî stranêni GATHA da gelek tişt nayêni ditin; lê digel viya, tiştêni ku hatine ditin ji rast in. Dî wan stranêni wi da tasvîra pêxemberekî mezîn, mîrxas û xiretkêş; piri caran baweriyeke bêdawi û rasteqin, lê carna ji dî têkoşin û dijwariyan da dî rewşekê nézi bêhêvibûnê da tê ditin.

Stranekî ku ji bo xelkê û wek helbest hatiye nîvisandîn weha dest pê dike: "Bî dîl û can guhdari kin da ku hûn bîzanîbin çi baş e! Dî navbera herdu aliyan da hilbijartunek zelal bikin û bî ditunek rast lê bînîhîrin, bî mîrani, herkes ji bo şexsê xwe! Beri ku şerê mezîn dest pê bike xwe amade bikin ku, têkoşin li ali me

bîgîhîje encamê.” Lı gor wi (Zerdeş) şerê ku wê dî dawiya dînyayê da bête kîrin, gelek nêz e. û wê demê ne tenê şeytan, herweha hemû afîrandiyêñ xwedênenas wê cezayê xwe bîkşinîn; lı gor hilbijartînê bîgîhîjin daxwaza xwe; “mîrinê” dîbêje Zerdeş, û dema ku vê peyvê dîbêje ji aliki va lı ser neşabûna cehnimê û êş û janan difikire, ji aliki va ji insanên dirust û dadmend difikire, ku wê bîgîijin ew jiyana ebedi ya ku lı ali wê cih girtine.

Lı gor baweriya Zerdeş kesen bî şeref an ji dirust û xwedênenas ki ne? Em ji stranê Gatha têdîgîhîjin ku Zerdeş, dî serdema şerkari û êrişkariya hov da, dî dema jiyana koçeri ya adeti da jiyaye. Û ew li hember vê rewşê dertê holê. Barbari û bêserûberi tu car meriv nagîhîne şâhiyek û jiyanek ebedi. Teminiya Zerdeş ew e ku, zagona jîyanê urf û adet, hereket û tewrêñ dîlpak in. Yê ku - berewajiyê koçerên bêcîh û war- bî dindari û aqlmendi, dî civatek bî serûber da xwe amadeyi jîyan û çalakiya aşîtiyê kûriye, beri her tuşti ji bî axê û çandîniyê mijûl dibe riya jîyanê ditiye. (herweha tenê wi ditiye) Bî kurti em viya dîbihizin: “Kesê ku axê najo yan ji çandîni nake, û bî zanina xwe ya nebaş kesen cotkar ji karê wi dike, berbi hoviti û zîlmê dîkşine, bî kîryarêñ xwe yêñ xîrab û dinê sextekar hejmara şeytanîn zêde dike.” Lı ciheki dîn ji : “Guhdariya pevv û şiretên sextekaran neke; lewra ew ê bela û şinê bine pêşîya malbatê, eşirê, derdorê û welat; Wi bî şûrê xwe ji xwe dûr bîhêle!; guhdariya dadmendan bîke, guhdariya aqlmend û serûberkîre dînyayê bîke!”

Daxwazi û şertê basit û mezîn ê ku tê xwestin ev e : Jîyanek pakraman, xweşbêj û pakkîyar, bî edalet. Û tenê xwedayek dikare bersiva viya bide. Dî stranê reform da jî bili MAZDA û ruhêñ wi behsa tu xwedayek nayê kîrin. Jî bo hilbijartînê tiştê ku xwedi mane ye û gîring e, ev e : Ya hilbijartîna jîyanek koçeri yê serbixwe û bêserûber ê pîrxwedayı û sîruşti yan ji jîyanek bî edalet; ku ev jîyanek bî edalet insanan ji Şeytan û berhemâ wi ango ji mîrinê xîlas dike. “Hûn hemû, yêñ ku ji dûr û nêz hatine û dî lêgerekî da ne, gudari bikin! Niha hûn ê her tuşti gelek zelal û esehi hin bibin. Mamosteyê nepak û sexte, ango Şeytan, bî şiret û wazêñ xwe insanen dibe berbi hilbijartîneki şaş, lê wê dînyâ cara duduuya ji ali vi mamosteyê nepak û sexte neyê kuştin.”

Dî wê serdemê da tenê çend kesen bî hukim û xurt karibûn Zerdeş fêm bîkîranâ yan ji piştgiriya wi bîkîranâ. Yek bî yek dîhate qewirandin û carna dîhat ber sinorê dawi yê bêhîvîbûnê. “Ez berê xwe bîdim kijan welati, bî

ku va bîrevim? Ez ji heval û merivêñ xwe tecrit dîbim, dîjîminêñ min merivêñ min in, û herweha dewlemend û hukumdarêñ welat ji dîjîminêñ min in. Jî bo te çi dîkarim bîkîm MAZDA? Ez zanîm ku bo çi tesira min tune û nîkarim tişteki bîkîm: Mal û milkêñ min hindik e, û ji ali insanan va ji feqir im (ango heval û pêgîrtiyêñ min kêm in). Jî bo te dîgrîm MAZDA; lı min bînîhîre û alikariya ku hevaleki dîde hevaleki xwe bide min. Hukmê xwe nişan bide ku insan têbîgîhîjin ku bî edaletê ra kijan şahi peyda dibe.” Bî vi awayi Zerdeş ruhê bedena xwe wek diyari pêşkêsi MAZDA û melayketêñ wi dike; ew, raman û karê heri baş û mezîn dîde wan; ew, ji bo wan imkana belavbûn û xurtbûna gotunêñ pak peyda dike. Tevi hemû cûre felaket, bela û janan ji, bî vê ramanê baweri berdewam dike, baweriyeke mutlaq bî hatîna serdema imparatoriya Mazdayê dadmend tê, hêvi û guman nehatiye windakîrin û ev baweri dîçirise. Hebûna imparatoriya Mazda rast e, wek stran an ji beytêñ (Gatha) ji dîbêjîn, hertiş li dînyayê ye, heye; lê imparatori yan ji welatê jîyanek ebedi, piştî têkoşina mezîn a dînyayê wê bî her awayi peyda bîbe. ”Mazda, ji bo nexerabûn û nemîriya imparatoriya xwe soz daye,...”

Em nîzanın ku piştre çi bî serê Zerdeş da hatîye û ketiye çi rewşê. Belki ji wek fêkiyêñ waz an ji gotarêñ xwe bî tenê êş û jan kışandiye û ditiye. Lî qet şik tune, ku xebatêñ wi ne vala bûne. Ew (Zerdeş), ne tenê bî qurbanan lî razikirîna xelkê geriyaye da ku tenê Mazda bide qebûlkîrin, lê bî gotun û kîryarêñ baş ji ji bo pejirandîna wi (Mazda) xebitiye. Her çîqas bî temami bî ser neketîbe ji, bî wi ra dî dinê Persiyan da tişteki nû peyda bû. Jî bo riya jîyanek ruhi, edalet, jîyanek emin, paki û jîyanek ebedi û wek nan û av fîkra pêwistiya wan - wek ku we bihist- piştî gotarêñ Zerdeş di hemû nîvisarêñ AVESTA da cih digre.

Yêñ ku ji xwe ra li başiyê digerin, dikevin vê reyê û lî dû vê baweriyeke dîçin; yêñ nezan û bêfam ji, zagonê jîyanê xeradîkin û him ji bo mirîna xwe him ji bo mirîna dînyayê dixebeitin.

“Ev tiştîn han ji bo kesen bîaqîl zelal e, li meydanê ye,” dîbêje Zerdeş; “Ew (kesen bîaqîl) di gotun û kîryarêñ xwe da wê imparatoriya Xwedê pêşda bîbe.”

## Dawi

# MEM Û ZİN

*wek radyo-dramatik - 6*

## ROLEN DRAMATE

**MEM:** Zirkurê Alan Paşa

**ZİN:** Dota Mir Seydin

**QISEDAR (MÊR):** QM

**QISEDAR (JIN):** QJ

**HESP**

**QERETAJDİN**

**ERFAN**

**ÇEKAN (Çeko)**

**BEKIR (Beko)**

**DOTA BEKIR**

Radyodramatizekîrin:

**ROBERT ALFTAN**

Wergerandin ji swêdi:

Xalit Lezgin

(*Berdewam ji hej.* 37)

## **SEYDIN**

Te dit me çi kır.. Eger Qeretajdin û hevalên xwe ne bî me ra bin, hingê em ê çawa bikarîbin deh hezar siwari berhev bikin? Ki dixwaze mal û halê xwe şûnda bîhêle û here cengê. Eger ev hersê şêrên han negurmijin lî vê Cizirê halê min wê çi be? Serê min wê ji cendekê min bête jêkirin!

## **BEKIR**

Mirê min, ez dizanım Qeretajdin dixwaze miritiya te ji destê te bigre. Were keremke em harine mala wi xwe bavêjine ber bextê wi. Jêra bêje: Zinê desgirtiya te ye, eger tu pê razi yi ku

wê bîdi Memê, wê çaxê ez ji razi me. Paşê tev li ser vê pîrsê li hev têr û pîrs bî temami safi dibe.

QM

Mir û Bekir berê xwe dane mala Qeretajdin û çûn. Mir ji Qeretajdin ra got.

## **QERETAJDİN**

Mirê dîlovan, tu keremke vegere mala xwe, êdi ez çi dikim û çawa dikim ev karê min e.

QM

Qeretajdin Çekan û Erfan rabûn siwarbûn û li nav Cizirê gurzên cengê li bakırin û gotin:

## HERSÊ BIRA

Herçi kesên xwedi hesp, bila sibê zû, bî derketina tavê ra lî meydana bajêr hazır be.

QM

Wê şevê xew nekete çavê begên Cizirê. Dî şefeqa sibê da gişk lî meydana bajêr kom bûn. Dî şûna deh hezaran da panzdeh hezar mîr lî hev cîviyabûn.

## QERETAJDÎN

Xwedê hez bike dema em vege riyan em ê dawet û şahiya Mem û Zina dotmir bikin. De em bî rîkevin, bî diayê Xwedê û peyxember.

QM

Koma sıwaran bî rîketin. Lî nav Cizirê tenê mir Seydin, Beko û Memê man.

## BEKIR

Mirê min, tu çîma weha bî tenê rûniştiyi? Mîreki wek Memê Alan zavayê te ye, û hûn herdu ji esilzade ne. Bîla ji we ra kîşik bê û hûn bileyizîn. Eger dî serê we da fikir û xem pîr hene, kerem kîn bî listika kîşik wan belav bikin.

## SEYDÎN

Tu êdi zavayê min i. Lewma tu maqûl i û ez dîxwazîm bî te ra kîşik bileyizîm. De ka were em bileyizîn.

## MEM

Bî serkêsiya birayêñ min ordiyek esker çûn cengê. Zeman hêdi dice dema heval û hogir lî vir bin. Mirê min bî rasti ji wê geleki baş be eger em bî destek kîşik wextê xwe biborînîn.

## BEKIR

Hûn herdu ji hosta ne, werin bî şert bileyizîn.

## SEYDÎN

Em lî ser çî bileyizîn?

## BEKIR

Şertê listikê ez ê daynim, hûn ji qebûl bikin. Eger mirê min bî serkeve, emê daxwaza wi binin ci. Na eger Mem ji Mir bîbe, em ê sibê Zinê lî hespeki sıwarkin û bîbin daynin mala Qeretajdin heta ku ji şer vege riya.

## SEYDÎN

Ez vi şerti qebûl dikim.

## MEM

Mirê min ez ji vi şerti qebûl dikim.

QM

Lî ber kîşik rûniştin û dest bî listikê kîrin.

QJ

Ne Mir, lê Ezrail ji bîhata nîkaribû kîşik ji Memê bibîra. Memê nehişt Mir çavê xwe veke.

## BEKIR

Keçê remlê bine, veke ka axîriya listika Mir û Memê wê çawa be.

## ZINA REMILDAR

(Bî qûmê fal vedike) Eger Zinê neçe li pêşberi Memê nesekîne, Memê wê zora Mir bihere.

## BEKIR

Zinê, zû bike were diwanê. Mir û Memê kîşik dileyizîn. Eger Memê lî hember Mir bî serkeve, lî gor qewlê wan gereke sibê te lî hespeki sıwar bikin û bîbin lî mala Qeretajdin daynin. Eva yeka ji disa min kîr...

QJ

Zinê rabû xwe xemiland mina bazîrganêñ zengin yên xwedi mal û karwan. Çû lî pêşberi mir rûniş.

## BEKIR

(Bî xwe ji xwe ra) Ma du kîş ku Memê ji Mir bîbe. Dîvê ez dîna Memê bîkîşinim ser Zinê. Wê çaxê remîl wê rast derdikeve. (Bî dengê bîlînd.) Mirê min

dîvê nuha hûn rabin şûna xwe lî hev  
bîguhêzin. Listik wê xweştir be.

### SEYDÎN

Memê, em ci bîguhêzin.

### MEM

Kêfa Mir çawa dixwaze. (Bî xwe jî xwe  
ra.) Zinê, delal mîn Zinê, çiqas jî bedew e  
dî nav wan kîncan da. Em ê disa kengê  
hevdu dî baxçeyê nependi da bîbinin?

### SEYDÎN

Kîş!

### MEM

(Bî xwe jî xwe ra.) Zinê tu jî wextekê be-  
dewtir û delaltır i. Zina delal, qasi ku ez  
jî te hez dikim, dî dinê da jî tu tişteki din  
hez nakim.

### ZİN

Memê, mîrxasê ber dîlê mîn.

### SEYDÎN

Kîş-mat !

### BEKIR

Mirê mîn icar gereke tu gotina xwe bini  
ci û gengeşiyê jî ortê raki.

### SEYDÎN

Memê, nuha mîn jî te bir! Tu êdi bêçare  
yi. Ez ê te bavêjime zindana keviri.

### QM

Welê Mir gotina xwe bî cih ani, Memê  
avêtin zindanê. Şes mehan dî zindanê da  
ma û geleki nexwêş ket.

### QJ

Zinê bî şev û roj gîriya û jî qedera xwe û  
Memê gazin kîrin. Zinê bêçare bû.

### BEKIR

Mirê mîn, mîn bîhist ku Qeretajdin wê dî  
wexteki nêzik da vegere Cizirê. Ew û  
birayêñ xwe wê bîxwazin tola Memê

bîstinin. Ya baş ew e tu Memê serbest  
berdi. Bîla Memê dî zindanê da nebinin.

### SEYDÎN

Bekir here Memê jî tariya zindanê bîde  
azakîrin.

### QM

Lê bekir berê çû cem keça xwe, Zina  
remildar.

### BEKIR

Remildarê, dota mîn, gereke Memê  
bîmre beriya ku ez herim bî destê wi  
bigrim û jî zindanê derxinim.

### ZINA REMILDAR

(Bî qûmê remil datine) Eger mîr herin  
memê derxin jî zindanê, Memê wê sax  
derkeve. Na eger jin wi derxin Memê wê  
bîmre. Gerek jin jin wi bikujin, erê jin wi  
bikujin. Bîla Memê bîmre, madem mîn  
naxwaze, bîla bîmre.

### QJ

Bekir paşê çû cem Zina xemgin,  
hezkîriya Memê.

### BEKIR

Zinê, dîlê Mir jî ber vi halê te geleki  
diêşe. Bî rasti pîr ber te dikeve. Mîn jê  
tika û rica kur ku Memê aza bîkc. Nuha  
here ali wi bîke û jî girtixanê derxe.

### ZİN

Geli cariya Memê azad bû! Zû weriseki  
binin em berdin qula zindanê û Memê  
pê bîkîşinin der. (Bazdîdîn, dengê tepe-  
repa piyê wan.)

### ZİN

(Dî kuleka zindanê ra serê xwe dadixe û  
bangi Memê dike.) Memê! Ez hatim  
alikariya te bîkim, jî zindanê derxinim.  
Du azad i! Em ê disa hevdu hembêz kîn  
û bigihijin mîrazê xwe!

### MEM

Ax Zinê, tu wek gulekê yi, erê guleke

bihnxwêş i tu. Lê tu nikari mîn aza biki.  
Ez dîzanîm xelaziya mîn tune.

## ZİN

Geli cariya, ka binin werisê zîrav  
berdîne bînê bira kûr  
bavêjîne nava Memê mîn-i delal  
Geli cariya! zû bikin, werne hewar!  
dî kuleka zindanê ra  
werisê sîpi berdîne xwar,  
Ax , çî nexwaş e Memê, delalê mîn!

## QJ

Zinê û cariyan bî hevra weris hilbirin. Bi hemû hêza xwe kaş û hilkaş kîrin ku Memê jî birê derxînîn.

## ZİN Ü CARIYAN

Haydê! Ya Allah ya Xudê! (Deng- qırpe-qırpa weris.) Haydê kaşke! Ya Xudê! (Dengê weris.) Ya Xudê! (Weris dîqete.)

## MEM

(Deng alan dîde.) Zinê delala mîn, cîma jîn nîkarîn girtiyeki ji azad bikin? (Dengê axin û nalinê.)

## QJ

Memê jî dest çû, delala wi Zinê perişan û bêçare ye nuha.

## ZİN

Geli cariya ez ê lî ber gora Memê bisekinim, hûn herin jî Mir ra bibêjin Zinê wek teyrê ser cûcikan lî ber gora Memê dîpê.

## SEYDÎN

Zinê guhdariya mîn bîke, ax ax, tu belayê tini ser mîn. Ez ê lî Cizirê jî te ra dawet û şahiyeke wîsa çêkim ku dem û dêwrana da kesi nedîtibe, ne bîhistibe. Tenê tu jî xwe ra xorkeki ciwan bîbine ku jî Memê zehftir jî te ra layiqi te û hîzkîrinâ te be.

## ZİN

Bî rasti, bav û mirê mîn, te guh da derew û bêbextiyêñ Beko heta ku te ez wîsa herçiqandîm. Edî jiyan lî mîn heram bû, ez ê jî bîmrîm. Bîla gunehê mîn lî stuyê te be, eger tu gora Memê venekî û mîn jî lî kîleki wi çal neki. Bîla pişta me di hevda be. Ez dîzanîm Qeretajdin wê vegere û mezelê wi veke. Dema te dit ku berê me di hevda ne û dilopêñ muc ewher lî ser eniya me dîbirîqin, hîngê tu bizanîbe em çîqası jî hev hez dîkin. Eger ne wîsa be, wexta we gor vekir, hîngê laşen me bavêjin çolê. Eger tu wek daxwaza mîn neki, lî dînya dîn destê mîn wê bî pêsirote va be.

## QJ

Piştî ku Zinê mir, lî ser daxwaza dota xwe Mir ew xîste nav gora Memê.

## QM

Qeretajdin û siwarêñ pêra, jî dûr va xuya dîkin. Ew bî lez û bez nêzik dîbin.

## QM + QJ

Qeretajdin, Erfan, Çekan bî hezar siwarêñ xwe va ajotîn ser gora Mem û Zinê.

## CIVAT

Hemû sûc yê Beko ye! Hemû sûcê Beko ye!

## QERETAJDÎN

Gazi Boko bikin! Gorê vekin!

## QM + QJ + CIVAT

Wana berê xwe dane hev! Wan xwe zivîrandiye! Bînêre dilopêñ xwidanê lî ser eniya wan dîçirise! Dîbinin çawa dîçirise!

## QM

Bekir ji xwe dî ser gorê da xûz kîr û lê mîzekir.

## QERETAJDÎN

Beko, nuha dawiya jîna te ya derewin

hat. Ez ê bî şûrê xwe serê te ji cendekê te jêbikim!

(Deng, dema Qeretajdin serê Bekir bî şûr dibire)

QJ

Serê wi glol bû û çend gavan ji cendek wêda çû.

QM

Lê tenê yek dîlopek xwina Bekir pekiya nav gorê, navbera Mem û Zinê.

QJ

Jî vê dîlopa xwinê dîrkek bî striyên tûj şin bû. Loma heta iro ji tê gotin ku:

(Dengê qelebalixa meydanê)

QM

Lî ser gora Mem û Zinê du gulên bedew ûbihnxwêş şin dibe, lê dî navbera wan herdu gulan da dîrkekî kelemtûj

derdikeve nahêle ew bigihêñ hev.

QJ

Û gelî guhdarêñ delal, gelo hûn meraq dikin ka halê Cizira Botan çawa bû paşê?

QM

Pışti zemaneki, rojekê hespê Memê ji tewlê derket, berê xwe da bajarê Muxrizemin. Çû cem Alan Paşa û yeko-yeko salixê Memê û serpêhatiya wi jêra da.

QJ

Hingê Alan Paşa leşkerekî giran berhev kîr û ajote ser Cizira Botan. Dema dî ser Cizirê da girt, bajar kîr gola xwinê, çıqas kes û xismêñ Mir Seydin hebûn tev kuştin. Tenê yek mîrek jî kuştinê filiti ew ji wê gavê ne lî bajêr bû. Heta nuha li vêderê tu kes lî xwe nehatiye mukurê ku zarokê zarokê wi kesi ne.

DAWI

## Mîstefa Budak

(Jî mîr û mîrxasê zana  
Mîstefa Budak re)

## VEKIR GULA AZADI

Mîrê pêşeng û zana  
Xwe da Riya Azadi  
Vaye deşt û zozanan  
Vekir gula azadi.

Cax û dema diroka,  
Em xistun ber derbûka  
Lûl bû dara şekoka  
Ajda koka azadi.

Armanca te ajdaye,  
Karpêka te roj daye.  
Karker, cotkar hêz daye  
Lî ser riya azadi

Gulan xwe dan baxê te  
Lî ser cih û axê te  
Bî dû rêç û gavê te  
Ketin Riya Azadi.

Rojê xwe da ser hivê,  
Lî ser axa Haysivê  
Kakil daye behivê  
Bî barana azadi.

Hevalbend û gundiya,  
Tîrs kîr zikê rovi ya.  
Tavê xwe da ser çiya  
Derket roja azadi.

Ew xurtmîrê pehlewan  
Tîrs û xof da kela wan,  
Ber bî jêre ala wan  
Biji şerê azadi.

Jî baxçê te gulbax im,  
Gulan ber wan ranaxim,  
Ez Ezman im, têr wexwum,  
Lî ser kaniya azadi.

Mîstê Budê birnakim  
Dî navâ dil û gulan kim,  
Bî histêra çavan kim,  
Dî nav gorna azadi.

*Ezmanê Kari*

## LO ŞIVANO

Gur û çaqalên çiya  
Lîser deşt û baniya  
Çav berdan berx û miya,  
Dibê berxê ez te bixwum  
Berf û baran ser te bixim.

Lo şivano berya deşte  
Pez û miya xwe da piştê  
Guran dev da li tenistê  
Dibê berxê ez te bixwum.  
Şin û şivan ser te bixim

Lo şivano vaye gur hat  
Lî paş çiyan nalin kûr hat,  
Nav zinaran xwina sor  
Dibê berxê ez te bixwum  
Şeva tari ser te bixim.

Tu şivanê berxa salê  
Mi diçêri berx dikalê  
Guran deng da li tengalê  
Dibê berxê ez te bixwûm  
Tofa giran ser te bixim.

Gura xwe da nav zûxûra  
Ber newalan paş keviran  
Te pez daye devê guran  
Dibê berxê ez te bixwum  
Kel û giri ser te bixim.

Lo şivano rabe ser xwe  
jê têrnebûyi xewa xwe  
Vaye guran pez dan ber xwe  
Dibê berxê ez te bixwum  
Tîrs û xofa ser te bixim.

*Ezmanê Kari*

# NÊRİYÊ BEL Û SEHÊ ŞİN

Beri sedê salan koçerên mira pez xwedi dikirin û ji lewra çûn hatin dikirin, lı zozan û beriya. Salekê hatine lı beriya Şingalê bela bûn lı van gunda, Gır Kember (Tîl Koçer) Girkê Fîriz, Gır Tolik, Bira Brahim Axa, Bra Rovi-Hamoker, Gola Şêx Temo. Lı wan gundan zivistana xwe bûrandine. Û dî dawiya avdarê (adarê) de ji wêderê cihê xwe guhertine û vegeiyana ber bî havingehêن xwe ve.

Qonaxa 1 lı çemê Sîwêdiyê danine û çend roj bûhartine.

Qonaxa 2 lı Gır Xerdel danine.

Qonaxa 3 lı beroja Qereçoxê danine.

Lı hêrikê lı bînya çiye pezê Cangirê Bîro hêdi hêdi lı dû mala dimeşîyan. Cangirê Bîro yek ji wan koçerên xwedi pez û bî nav û deng bû dî nav koçeran de, dî nav keriyê pezi wi de nêriyek hebû. Ev nêri ji dî bû pêçivanê pez ji ber ku pîr şareza û jîr bû. Û wekû hûn tevde ji zanîn ku her koçerek sehek xwedi dikir, ji bo berevaniya pezê wi bike. Cangirê Bîro ji seheki wi yi şin hebû (sehê zozana). Dema direya gup gup ji dengê wi dihat. Ji ber ku pîr bi hêz bû û tu berevan mina wi tune bûn. Gur û dehbe ji pezê Cangirê Bîro bê par mabûn.

Dema ku ev keriyê pez hêdi hêdi dimeşîya erda ezidiyan. Ew ji lı dû wan dimeşîyan û mîrivana wan dikirin. Ta dî asitengekê dewan bigrin. Lı hêr û newalêñ bînya çayê Qereçoxê kesa ji xwe dî wan de ditin û şivan û sehê (û nêri) qonaxeki dîrêj meşîyan ta ku gihiştin nêziki ciyê. Û zanibûn ku heger şivan berdin ji

nema kare tu kîrê bike û gazin nagîhê wan. Şîvan lı wir berdan û ew azad kîrin.

Şîvan rê girtin û berê xwe dan cihê ku jê hatîbûn (Qereçoxê) ji bo lı malan bikin hawar. Bî rê girtina wan re berê pez û nêri û seh ji nejda êzidiya hat guhartin û dan dû şivanêñ xwe nejda yêzidiya nêri girêdan û disa ew dan pêşıya pez û pez dan pêşıya xwe û ciyayê Şengalê derbaz kîrin.

Şîvan ji gihiştin nav mala roli çêlek dana bû. tiştê bî ware bûri tevde ji malan re gotin. Lê gotin bê zûde bû (dema ku ejeki lı talanê yê dî xîsta û bîghanda malêñ xwe kes nedana lı dû dîçû dî gaziyyêde) Mirana tevli Cangirê Bîro ji Qereçoxê bar kîrin û li quesra Mameşûrê danin. Çend roj lı bûrandin û ji wir ji barkîrin, û lı quba ba Hozê (Eleşêr) ci-girtin.

Piştî demek din ji wir ji bar kîrin û li Çemê Mezrê danin lı ber ava mezin.

Li ser avê dahol û zirne lêdixe û kelek û gemi mal û zarok û pirekan ji avê derbaz dikin û kesen ku bî avê ew ji lı derfê xwe siwar dibûn û pezê xwe derbaz dikirin.

Û bî vi rengi tevde ji avê derbas bûn û riya xwe girtin û berê xwe dan Qesrika Gêlê û ji wir berê xwe dan Herekolê û jê derbas bûn çûn deşta Hîncê û çûn çemê darberû, û ji wir çûn çemê Karê û bajare Meksê derbas kîrin. Û her kes lı ciyê xwe ci girtin use xwe zoza û navê cihê wan ji evi n: Kêlçûk, Armas, Xwêrêz, Kani Reş Kevet Ermişt.

Cangirê Bîro ji çû lı zozanê Kevetê rûnişt tev li çend malêñ din û her yek

çûn kepira xwe û lî ser av û delavê xwe ci girtun.

Cangirê Biro tevde kom kîrîn û weha got:

-Yê pezê xwe bin ser delav, pezê min av bide û lî mexelê ez wan tevan bikujim.

Ü herkes lî ciyê xwe ma û nîha em ê vegeerin li çiroka nêriyê.

Dî wan rojênu ku pez lî cem Êzidiyan mabû. Nêriyê Şehreza roj û çev lî xwe kîrîn yek bî raman û tevger dixwest ku rîkê bibine ku pez bide dû û pê xwe û berê xwe bide zozanê xwe.

Şevek jî şevê Cehzera şivan jî pezê xwe ani û lî guherê mexel kîr û çû mal. Nêri dit ku şev tari ye û şivan jî çûye û eve ku şeve nêri lê diyariya lî dora pez çû hat û ew şiyar kîr û çû ber sehê şin lingênu xwe lî erdê xist û ew ji hisyar kîr.

Dî nav pez de meşî û kîr pîrkin û got va ez meşim, bîdîn pey min. Tevde bi rî ketin. Nêri bû serşivan û sehê şin bû dûvajo bî vi rengi alikariya hev kîrîn û pez ajotin hetani ro derket xwe jî ciyê berdan xwar û lî newalekê lî bînya ciyê xwe hêşargeh kîrîn.

Nêri jî dî nav pez de mexel bû û sehê şin ma hisyara, lî dora pez diçe û tê, na-hêle pez bela bibe. Ü bî wi rengi bî roj û şevê bî rî dîketin ta ku gihan Ava Mezin, xwe vedışartın.

Av jî derbas kîrîn, nêri lî pêşiyê û sehê şin lî pey pez ketin nav çiya, dehl û ne-wal û devi, gihan ciyayê Herekolê. Bî şev dîmeşîyan, jî nişkêva nêri lî pêşiya pez sekini û kîr pîrkini, pez paşde reviya, sehê şin dit ku lî dora pez dengê gura tê. Paşva çavênu xwe gerandin gureki êrişek dayê wek birûskê ew avêt xwar. Ü bî vi rengi du-sê gur kuştin û berê xwe dan zozanê Kevetê, gihiştin ser delav. Av xwarin û pez lî guhera xwedîyê xwe (Cangirê Biro) mexel hat û nêri çû lî ser kevirê xwe mexel bû.

Cangirê Biro, jî xew rabû, lê hin tari wenda nebûye û bene sîpi û reş jî hev nayê naskîrin.

Cangir dit ku keriyek pez lî mexelê pezê wi mexel bûye û nêriyek jî lî ser kevirê nêriyê wi ye.

Bê here nav pez û yan jî bipirse ka ev

pezê kî ye. Bê seri lî malê vegeeria, rahişte tivengê û meşî, çend gava jî malê dûr ket çokê xwe da erdê û tiveng kişand milê xwe û deng kete tevenga sêtire nêri lî ser kevir bû kesire rabû û bî bez çû çiya, rex kevir, lê nêri nêriyê wiye miri, hish û sewi da, dî seri da nema dî seri da rûnişt lî ber serê wi û got:

Belo, bel beleko.

Te serê saxa zirave binê wa xeleko.

Keja te jî er müşmê pengo

Mala xwedîyê te xirabe, lî te kiriye xelat heft  
rengo.

Belo, bel kevero.

Te serê bîska sorin bîmê wan zero.

Herdû çavê te bîrijin koro

Ser şivanê pezê xwe naz nekîro.

Belo, belê mino.

Tû rabe rûnê lî cem mino.

Agîr ketiye mala xwe yê te jî ser û bino. Ka pişti te ki wê bîbe sermiyanê pezê mino.

Cangir:

-Sehê şin tu were, ne tû wi bîra ne, jî min ra bêje çi raye û çi derman e. Ezê herim binim jî dêra Extêmârê jî nav filane, jî min ra got tiştê mîro bîxwe bîke jêra nine dermane.

Sehê şin:

-Te çîma usa kîr kumdirêjo. Çavê te kor bûne û mala te xirabûye jî mêjo. Me talan jî tera anîye, ew ser şivan ez ji dûvajo. Qencîya te jî bir nakîm, mala te ava mîrkujo.

Cangirê Biro:

-Ezê rabim herme çarşema Mîkişê, ezê bikirim kîlê Belê xwe, sîpi bikim bî kîlsê turba wi çêkim lî bînya ciyayê Ermûs lî wê bestê jî bona her kes bîbîne jê derbas nebin û bîbe ciyê pîrsê.

Turba wi lî bînya ciyayê Ermûsê çêkir heta nîha jî bî serê Belo û kelên sîpi sünd dîxwin xelkê wi ciyi.

Bavê Sero

# GIRAVA GEROK



Eger yek derê û pîrske, "gelo li dînyayê giravek heye ku lî ser avê digere yan ji cih diguhêre?" Wê herkes tînazê xwe bî pîrseke weha bîke, lewra giraveke weha tenê dî çirokan da, tenê dî efsaneyan da, tenê dî fantasiyan da dikare hebe. Lê pêwist nake em dûr herin û vê fantasiyê dî efsane û çirokan da bigerin.


Şeş (6) km nêzi riya Bingol - Solxanê lî mezra golê ya Aksakal, ku girêdayî gundê Hezarşahê ye, giraveke gerok bî hemû hêbeta xwe xeyalên çirok û efsaneyan ji riwayetan derdixe û dîke rasti, radixe pêş çavên me. Lî vê mezrayê, lî ser tepeyeki bîlind dî nav hêşinayıyan da golek heye. Ev gol bî çapa xwe 300 m<sup>2</sup> ye û lî ser vi golê giraveke gerok lî çaraliyê golê digere, yan ji wek keşti bî kuda bixwazi te digerine. Lî ser giravê darûber ji

şin bûne ku hêjahiya giravê bilindtir dîke û dîke şahesereke yekta lî dinê.

Xusûsiyetên vê golê tenê bî girava xwe ya gerok naqede. Eger em behsa xusûsiyeteki dîn bikin, wê disa gel tiliyê xwe gez kel.. Ev gol bî kûrahiya xwe 80 - 100 metre ye û tama ava wê berbî tahliyê ye. Eger meriv eşyayek madeni lî vê avê xe, dî cih da rengê madenê diguhure û dîkeve rengê zêr.(Ji bo agahdariyeke firefir hûn dikarin lî pirtûka Selahaddin Mihotulli ya bî navê "Arya Uygarlıklarından Kürtlere" binêrin.)

Dîbe ku, ji bli van xusûsiyetên nediti û nebinahi gelek xusûsiyetên müci-zewi ji hebin. Lê mixabin ku heta niha lî ser vê golê lêkolin û agahdariyê têr û tije dî dest da tunene.





Bîha: 15 Skr.